

**D**i her du rojên civînê de, pirs-girêka Başûr hate masetê û bi giranî li ser têkiliyên hinek rêxistinên bi dewleta tirk û dagirkeriyê re hate rawestîn. Hate gotin ku ev nakokî û şikestikên mezin ku digihêjin radeya îxanetê, ji ber nebûna kongreyek neteweyî derdikevin holê, ji ber vê çendê rojekê berî rojekê pêdiviya lidarxistina kongreyeke neteweyî heye.



Di Konferansa Amadekariya Kongreya Neteweyî de daxwazek ji ev bû:

## Divê îxanet bê darizandin

Hevpeyvîn li gel Emin Gürses:

PKK wekî  
dewletekê ye

R. 8-9

Murathan Mungan:

Ez dixwazim destana  
Kawa binivîsim

R. 10


Ahmed Hüseyin:

Şîrê helal û  
azadiya welat

R. 6



## Azadiya WELAT



SAMI TAN

Li gorî stratejiya nû ya dewletê divê tîkiliyên gerîla ên bi gel re bibirin, her wiha jî tîkiliya gel bi cihanê re jî bibirin. Di vî warî de dewlet rêxistinên demokratîk li ber xwe wekî kelem dibîne.

## Stratejiya nû ya dewletê û yekîtiya bindestan

Civîna Yekîtiya Ewrûpayê ku li Strasbûrgê çêbû, bû sedema silikîna rayedarên tirk. Piştî vê civînê xewnerojka rayedarên tirk dageriya xewnerêşkê. Tirkiye nekete nava dewletên ku di pêşerojê de bi wan re nîqaşa endamtiyê bê kirin.

Li ser vê helwestê, serokwezîrê dewleta tirk Mesut Yılmaz da zanîn ku êdî ewê kêşeyên siyasî yên Tirkiyeyê bi rayedarên Yekîtiya Ewrûpayê re nîqaş nekin. Li gorî nirxandina rêveberên komeleya mafên mirovan, êdî wê binpêkirina mafên mirovan zêdetir bibe.

Jixwe, niyeta rayedarên tirk bi êrîşên polîsan ên li ser xwendekaran û polîtîkayên li hemberî girtiyan zelaltir dibe. Heftêya çûyî li Enqereyê polîsan êrîş bir ser xwendekarên ku ji bo piştevaniya hevalên xwe yên girtî civiyabûn û 500 xwendekar girtin.

Li aliyê din hewl û xebatên ji bo bicihkirina sistema hucreyan li girtîgehan û li hemberî vê yekê jî liberxwedanên girtiyan azadîxwaz her diçe zêdetir dibe.

Niha li çend girtîgehan greva birçîbûnê gihîştîye radeya bi xetere, bi taybetî li girtîgehên Nazilli û Erzeromê rewşa girtiyan di grevê de giran e. Bi tenê malbatên girtiyan dixwazin hin çalakîyan li dar bixin, ew jî tûşî terora fermî dibin.

Li bakurê Kurdistanê dewlet ji bo ku dengê gel bi giştî bibire, çî jê tê dike. Pêşî İHD, Ûlkede Gündem, Emek niha jî kesên ku li MED-TV'yê temaşe dikin, dibin hedefa êrîşan. Piştî civîna MGK'ê, RTÜK amadekariyê dike ku dengê radyo û televizyonên dijber jî bibire.

Ev êrîş, giş parçeyê stratejiyêke artêşê ne, li gorî vê stratejiyê ji bo çareserîya qaşo ya kêşeya kurd, pêdivî bi sînorkirina hêza gerîla heye û ji bo vê yekê jî pêdivî bi êrîşên tund ên li ser gel heye. Dewlet dixwaze tîkiliya gel bi cihanê re jî bibire. Da ku kes nizanibe çî tê serê gelê kurd.

Di vî warî de dewlet rêxistinên demokratîk û saziyên ragihandinê yên dijber li ber xwe wekî kelem dibîne. Lewre bi taybetî dozên ku li Ewrûpayê bi alîkariya İHD'ê li dewleta tirk tên vekirin,

wê dixin nava tengasiyêke mezin. Di qada navneteweyî de dibin sedema teşhîrbûna dewleta tirk. Bo nimûne, li ser van encama van dozan navê "tecawizkar û îşkencekar" li Tirkiyeyê hate kirin. Piştî rexneyên bi vî rengî, serokwezîrê tirk xwest ku bi giştînameyêke reaksiyonan nerm bike, lê rojnameya Ûlkede Gündem heman rojê di manşeta xwe de da zanîn ku zarokê bi îşkenceyê hatiye kuştin.

Li hemberî vê stratejiyê divê hêzên azadîxwaz bibin yek û dengê xwe bilind bikin. Di vî warî de xebatên ji bo Kongreya Neteweyî hêviyê didin mirov, lê divê li Tirkiye û bakurê Kurdistanê jî derdorên demokratîk hêzên xwe bikin yek û nehêlin ku dagirker û mêtînger xesarê bidin gel û girtiyan azadîxwaz. Her wekî mamosta Haluk Gerger heftêya çûyî di sempozyûma Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê de got, dema ku em hêza xwe bikin yek, ev rejîma dûrî rastiya gelên Anatoliyê nikare demeke dirêj li ber xwe bide.

## Tecawiz stratejiyêke şer e

## Ferhengok

<b>alîgir:</b> layengir (tarafdar)	<b>hemwelatî:</b> welatî (watan-daş)
<b>asayî:</b> normal (olağan)	<b>herêm:</b> dever (bölge)
<b>ast:</b> rade (düzey)	<b>helsangandin:</b> nirxandin
<b>avzêlîk:</b> herz (bataklık)	<b>hevalbendî:</b> itîfaq
<b>bêgavî:</b> mecbûriyet	<b>hêma:</b> nîma (imge)
<b>bûka berfîn:</b> kardanadam	<b>hîlberfîner:</b> adanî (verimli)
<b>bîlêvkirin:</b> telafûzkirin	<b>hîmdarfî:</b> bingehavêj
<b>bingeh:</b> him (temel)	<b>hindikahî:</b> kêmnetewe (azınlık)
<b>cudaxwaz:</b> cudakar	<b>ji rêzê:</b> siradan
<b>cihêreng:</b> xweser (özgün)	<b>kan:</b> jêderk (kaynak)
<b>Çarentûs:</b> qeder (ahınyazısı)	<b>kendav:</b> xelîc (körfez)
<b>çîn:</b> sınıf	<b>mayinde:</b> timî (kalıcı)
<b>dabaş:</b> babet (konu)	<b>milkuftî:</b> gîlî û gazin (sitem)
<b>dadgeh:</b> mahkeme	<b>misoger:</b> dabîn (kesin)
<b>dafik:</b> xafik (tuzak)	<b>neteweperwer:</b> nasyonalist
<b>damezrandin:</b> avakirin	<b>nof:</b> kom, heyet
<b>dawer:</b> remz (sembol)	<b>peros:</b> heyecan
<b>destûname:</b> qanûna bingehîn (Anayasa)	<b>perogîn:</b> heyecanlanmak
<b>desthilatdar:</b> serdest	<b>perwerdehî:</b> hêvotîn
<b>demdemî:</b> netimî (geçici)	<b>pewyendî:</b> tîkîlî (ilişki)
<b>dubendî:</b> bê îstîqrar (tutarsızlık)	<b>pêşnûma:</b> tasarı
<b>dimen:</b> xuyank (görüntü)	<b>pêşbînk:</b> pêşbazî (yarış)
<b>dijwar:</b> zehmet (çetin)	<b>pêşverû:</b> pêşkeftî (ilerici)
<b>dîkirandin:</b> derbirin	<b>raborî:</b> raburdû (geçmiş)
<b>dîyar:</b> eşkere (belli)	<b>ravekar:</b> şîroveker
<b>endamê hîndekariyê:</b> perwerdekar (öğretim görevlisi)	<b>renc:</b> berhem (ürün)
<b>ewlehî:</b> ehemîyet <b>erênî:</b> pozîtîf (olumlu)	<b>sazkirin:</b> organizekirin
<b>ferhengî:</b> çandî (kültürel)	<b>sûdwergirtin:</b> îstîfadekirin
<b>gîrse:</b> cemawer (kitle)	<b>taybetî:</b> gewşîn (özellik)
<b>handan:</b> teşwîqkirin	<b>têkçûn:</b> pelişîn
	<b>tund:</b> tûj (şiddetli)
	<b>ûlîyak:</b> narkotîk
	<b>vekwendin:</b> dawet kirin

## EMİNE İGDI

Dîrok bi şer heye. Li ser rûyê cihanê, cografyayên dewlemend bûne qada şeran û şahidî jî şerên mezin re kirine. Di van şeran de gelan dewlemendiyên xwe yên sererd û binerd wînda kirine. Azadiya xwe û heysiyeta xwe jî wînda kirine. Şerên ku armanca wan rê li ber azadî û heysiyeta gelan girtin be, ew şer, şerên qirêj in.

Di hemû demên dîrokê de kesên serdest ji bo ku bibin xwediyê cografyayên dewlemend pêşiyê ew gelê li wê cografyayê ji xwe re kirine kole û heysiyetê wan a neteweyî û îradeya wan şkandine.

Di roja me de Mezopotamya şahidiya şerê bi vî rengî dike.

Her roj li vî cografyayê ji bo ku mirovan ji cih û warê wan bikin, xanî û gund tên şewitandin. Li vî cografyayê her roj pelçimek zer dibe û dikeve ser axê. Her roj mirov bi dengê mitralyozan hişyar dibin. Dayik lorîkên pir zîz û bi şewat di berbanga sibehê de li ser çavreşên xwe dibêjin li vî cografyayê.

Li ser vî axê her roj mirov bi îşkenceyê tên kuştin.

Di bin çavan de dest davêjin ji-

nên me. Li keçên me tecawiz tête kirin.

Di civakên kapîtalîst de, jin hem ji ber cinsê xwe, hem jî ji ber nasnava xwe ya çînî tête perçiqandin. Lê belê jina kurd ji bo nasnava xwe ya neteweyî jî tête perçiqandin. Bi şerê li welatê me tête meşandin jin ji ber nasnavê xwe yê çînî, çînî û neteweyî tene çewsandin. Hê pirtir jî jina kurd ji ber nasnava xwe ya

Tecawiz stratejiyêke şer e.  
Li welatê me, di sala 1991'ê de 9, di 92'yan de 24, di 93'yan de 22, di 94'an de 36 jin hatine tecawizkirin.

neteweyî zilm û zordariyê dibîne. Dewlet bi awayekî nemirovî û bi zordarî bi ser jinan de diçe, dest di-avêje namûsa wan, tecawûzê li qîzên me û jinên me dike.

Dewlet li şûna ku van leşker, polîs û cerdevanan bigire binçav û ceza bike, kesên ku li wan tecawiz hatine kirin, digire. Tecawiz siyasa dewletê ya şerê qirêjî ye û ne bîyî zanîna dewletê tête kirin.

Tecawiz, ne karê du-sê ehmeq û nezanan e. Tecawiz, ji bo mirov neyarê xwe ji holê rake, çeka herî

karîger û mezin e. Kesên ku tecawizê dike wê gavê armanca wî ne jinek tenê ye, armanca, di şexsiyeta jinê de jiholêkirina geleki ye. Şikandina şeref û heysiyeta geleki ye. Di her dema dîrokê de tecawiz bi vî armanca hatiye kirin. Tecawiz ne li jinê tenê tête kirin. Mêr jî bi tecawizê re rû bi rû dimînin. Lê belê li gorî edeta kurdan, cihe jinê cuda ye. Jin û namûs bi hevûdin ve girêdayî ne. Dema dest avêtin namûsa jinê, tê wê maneyê ku dest avêtine namûsa mêran û mala jinê û civaka ku jin di nav de dijî jî.

Tecawiz, stratejiyêke şer e. Li welatê me, di sala 1991'ê de 9, 92'yan de 24, 93'yan de 22, 94'an de 36 jin hatine tecawizkirin. Di sala 1995'an de jî 22 jinan serî li TIHV'ê dane û dane xuyakirin ku di binçav de hatine tecawizkirin.

Di serî de jin nepeyivîn û şerm dikirin. Lê vî dawiyê di serî de bi ravekirina Şükran Aydın ve, Remziye Dinç, Asiye Zeybek, Zeynep Avcı û kesine dîtir, ev qirêjiya ku jiyane, anîn zimên. Ji van kesan Şükran Aydın ev mesele bî-AİHM'ê (Avrupa İnsan Hakları Mahkemesi 'Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê') û doz kar kirin dewleta tirk hate cezakirin.



Di Konferansa Amadekariya Kongreya Neteweyî de daxwazek jî ev bû:

# Divê îxanet bê darizandin

Konferansa ji bo amadekariya Kongreya Neteweyî, roja 13'ê berfanbarê li Brukselê, bi beşdariya gelek partî, sazî, rêxistin û rewşenbîrên kurd û Kurdistanî dest pê kir. Di her du rojên civînê de, bi gelemperî rewşa îroyîn û pirsgrêkên gelê kurd, çareseriyên pirsgrêkan û li ser pêkhatina Kongreya Neteweyî bi beşdariyeye dorfireh û di zûtirîn demê de, hate axaftin. Ji her çar parçeyên Kurdistanê partî û di ser 100 kesî re nûnerên rêxistin, saziyan û rewşenbîr beşdarî konferansê bûbûn. Konferansa Amadekariya Kongreya Neteweyî di bin hîmdariya PKDW'ê de pêk hat. Roja yekemîn li ser xala girîng (her du rojan jî bi piranî ew bû dabaşa guftûgoyan) hate rawestîn. Di nav vê xalê de, di vê salê de pêkanîna kongreyeye neteweyî, ku her kes cihê xwe tê de bibîne hebû. Her wiha ji bo pêkanîna kongreyeye wiha girîng, sazkirina komîteyê hate xwestin.

Der barê destpêka Konferansa Amadekariyê de, Endamê PKDW'ê Zübeyir Aydar wiha got: "Ji aliyê beşdarbûnê ve hêviya me hate cih. Heger ji ber sedemên postê û rêbûwariyên dût û karûbarê fermî nebûna, wê beşdarî bêhtir bûya. Lê ew kesên ku beşdar nebûne jî mesajên xwe şandine. Ev salek e ku em amadekariya vê civînê dikin. Beşdariyeye wiha pir û dorfireh dide nîşan, ku xebatên me di avê de neçûne." Her wiha Zübeyir Aydar li ser rojevê jî rawestiya û bal kişand ser, pirsgrêkên li pêşiya Kongreya Neteweyî û got: "Piştî guftûgoyan wê komîteyeye amadekar bête hilbijartin." Aydar, hêviya xwe der barê encamstandinê de bi xurtî diyar kir û di her du rojên civînê de bi dilekî rihet û aweke serketî qedandina civînê anî zimên.

Di destpêka civînê de, Serokatiya Rêveberiyê ya PKDW, Pêşnûmaya Destûrnameya Kongreya Neteweyî ku ji 5 beşan û 17 xalên mayînde, 5 xalên demdemî pêk dihat, pêşkêş kir. Di destûrnameyê de, gelê Kurdistanê, hemwelatiya Kurdistanê, mafên bingehîn, rêveberî û diyarkirina çarenûsê, prensibên bingehîn û armanca kongreyê, endametiya kongreyê û sond, saziyên kongreyê, nakokiyên di navbera hêzên Kurdistanî de û çareseriyê şerê di navbera hêzan de cih girtibû. Rêxistin saziyên ku nûnerên xwe şandinê konferansa amadekariya Kongreya Neteweyî ev bûn: "Hevgirtin, Welatparêz, YNK, Partiya Komunîst a Kurdistanê (Başûr), PDK- Sûriye, Partiya Parêzkarani Kurdên Sûriye, ERNK, PSK-Sûriye, Yekîtiya Şoreşgerani Kurdistan-Îran, Şoreşgerên Welatparêz yê Bethmahrîn (Asurî-suryanî), Hizbî Îslamî Kurdistan (Şêx Osman) û YNDK, her wiha saziyên Kurdistanî û nûnerên PKDW beşdarî konferansê bûbûn. Rewşenbîrên ku beşdarî civînê bûbûn ev



Siyasetmedarên kurd û endamên PKDW li meşa Bonnê têne dîtin.

bûn: Alî Qazî, Şêrko Bêkes, Sabrî Botanî, Dr. Sıraç Bilgin, Şêx Salih Lilezerde, Resul Hewarî, Şêx Îzeddîn Huseynî, Siyamend Meyinî, Dr. Nuri Talabanî, İbrahim Ehmed, Şerafettin Kaya, Dr. Osman, Necmeddîn Kerîmî, Dr. Musa Kaval, Resul Ruwarî, Prof. Nadîr Nadîrof (Kafkasya).

Konferansa ku du rojan di salona Hotel Erasmus de hate lidarxistin roja yek-

**Dr. Nuri Talabanî:**  
"Divê Dadgeheke Neteweyî bête avakirin. Kes û mirovên ku pê li berjewendiyên gel bike, di vê hêlê de gunehkariyê bike, bi dijmin re têkiliyan deyne û destên xwe bide dijmin û bikeve radeya îxanetê, gerek e di vê dadgehê de bête darizandin."

mîn bi giranî li ser yekîtiyê, pêdivî û girîngiya Kongreya Neteweyî, çareseriyên pirsgrêk û astengan, tevlebûna rêxistin, sazî û kesan hate axaftin. Di axaftinên têt guftûgo de, binbarî û berpirsiya rêxistinanan a dîrokî jî hate zimên û bala amadekaran kişandine ser venexwendina hinek sazî û komeleyên xweser. Ji ber ku di civîna berî salekê de hinek sazî û komelên xweser beşdarî civînê bûbûn, lê di vê civînê de nehatibûn vexwendin. Her wiha kes û saziyên ku nehatibûne bangkirin diilkulî û milkuliyên xwe diyar kirin. Di guftûgoyan de bi piranî li ser nakokî û şikestikên di navbera rêxistinanan de hate axaftin û ji bo çareseriyê ve-

pirsgirêka mezin bîr û raman hatin dikirandin. Di guftûgoyan de Dr. Nuri Talabanî li ser berjewendiyên gel rawestiya û bala beşdaran kişand ser vê mijarê ku rêxistin berjewendiyên xwe di ser berjewendiyên gelê kurd re dibînin. Dr. Talabanî pişt re jî wiha got: "Divê Dadgeheke Neteweyî bête avakirin. Kes û mirovên ku pê li berjewendiyên gel bike, di vê hêlê de gunehkariyê bike, bi dijmin re têkiliyan deyne û destên xwe bide destên dijmin û bikeve radeya îxanetê gerek e, di vê dadgehê de bête darizandin. Û bête teşhîrkirin."

Serokê Konseya Rêveber a PKDW'ê Zübeyir Aydar jî, rapora karûbarê du salan pêşkêşî konferansê kir. Di raporê de li ser kongreya sala 1995'an ku li paytexta Awisturya Wiyanyê hate çêkirin cih girtibû. Li ser vê biryarê jî di sala 1997'an de nofê yekem çû başûrê Kurdistanê. Di raporê de konferansa ku li Başûr, li bajarê Silêmaniyê di 4-5 ê berfanbarê de bi beşdariya 16 rêxistin, sazî û kesan hatibû lidarxistin jî cih girtibû. Roja yekemîn ji bo diwana konferansê Zübeyir Aydar, Dr. Mustafa Xolî û Dr. Cabbar Qadir hatin hilbijartin.

Di her du rojên civînê de pirsgrêka Başûr hate masetê (holê) û bi giranî li ser têkiliyên hinek rêxistinanan bi dewleta tirk û dagirkeriyê re hate rawestîn. Hate gotin ku ev nakokî û şikestikên mezin ku digihêjin radeya îxanetê, ji ber nebûna kongreyek neteweyî derdikevin holê, ji ber vê çendê rojekê berî rojekê pêdiviya lidarxistina kongreyeye neteweyî heye. Her wiha hate diyarkirin ku rêxistinên mezin û xwedî hêz PDK-Îran, PDK-Iraq, PDK-Suriye, PDK-Hevgirtin û PSK vexwendî konferansê bûne, lê beşdar nebûne. Piştî du rojan biryara hilbijartina komîteya amadekar hate standin û li gorî vê biryarê hilbijartin çêbû. Kesên ku hatine hilbijartin ji bo amadekariya Kongreya Neteweyî dest bi karên xwe kirin.

BRÛKSEL/MEDENÎ FERHO

## Kurtenûçe

Malbatên girtiyan, ji bo xwesteka sistema hucreyan ji holê rabe bi Serdozgerê Cumhuriyetê yê Stenbolê Ferzan Çiftçi re hevdîtinek pêk anîn. Di nav malbatan de berdevka "Platforma Maf û Azadiyan" Oya Gökbayrak ji hebû. Piştî hevdîtinê Gökbayrak daxuyand ku wan ji Ferzan Çiftçi re gotiye, ji bo ku nebaşî, nexweşî û mirinên nû çenebin divê sistema hucreyan ji holê bê rakirin. Her wiha li gorî daxuyaniya Gökbayrak, Serdozger Çiftçi gotiye ku ev sistem ji hêla "Wezarata Dadê" ve hatiye pêşniyazkirin.

Li Kolana Tandoğana Enqereyê Polîsan êrîş bir ser xwendekarên ku ji bo piştgiyaya hevalên xwe dimeşyan. Di vê êrîşa polîsan a ku roja 17'ê berfanbarê qewimî de, bêhtirî 500 xwendekar bi darê zorê û bi copan hatin binçavkirin. Gelek ji wan ji birîndar bûn. Hate ragihandin ku hê jî 16 xwendekar nehatine berdan. Wekî tê zanîn di 29'ê reşemiyê 1996'an de komek xwendekar, li meclîsa tirk "perwerdehiya bi pere" protesto kiribûn. Xwendekarê ku ji bo vê yekê hatibûn girtin, ji hêla DGM'ê ve hatibûn darizandin û 96 sal ceza ji bo wan hatibû xwestin.

Qereqola gundê Kêrikê ku li ser Elihê ye avêt ser gelek gundên derdorê, kesên ku MED-TV temaşe dikin, girtin binçav û dest danîn ser amûr û sêlikên peykan. Hate ragihandin ku fermanarê qereqolê Bekir, gelek kesên ji gundê Dawudiyê, Liçikê, Buruka, Reşikê, Gurgurî, Şerbetköy, Mêrina û Kêrikê roja 13'ê berfanbarê vexwendin qereqolê. Lê gundiyan guh nedan vê daxwazê. Lewre jî ew tevî leşkeran çû van gundan û peyk berhev kirin. Gundiyan bi navê M. Sıddık Seven, Selim Seven, Salih Seven, Hayrettin Sevim, Fahri Sevim... xistine bin çav.

Komeleya Mafên Mirovan ÎHD ihlalên meha kewçêrê ragihandin. Li gorî van ihlalan; 11 cinayetên failî meçhûl pêk hatine, hejmar kesên ku di bin çav de mirine 10 e; 157 kes di lihevixistin de mirine, 5 kes hatine windakirin, 54 kesî şikence dîtine, 5174 kes hatine binçavkirin, 96 kes hatine girtin, 2 gund hatine valakirin, 4231 kes ji kar hatine avêtin, 10 cih hatine bombekirin, 9 weşanên partî, sendîka û komele hatine girtin, 17 rojnameger hatine girtin, 16 weşan hatine desteserkin, 105 girtî ji ber ramanên xwe hê jî di gir tîgeh de ne.



# Şîrê helal û azadiya welat

"Yanê Xwedê bi min her tiştî, her kari bide kirin, lê karê dayikê ya xwedikirina zarokêki nede min ezê bêjim "xwedikirina zarok pir zehmet e." (Serokatî)

**D**ayik hêstirên çavan in. Xewa şevan nizanin, ew aramî ye, ked e, fedekarî û jîrbûn e, çavkaniya hezkirinê ye, şefqat e, zayîna jiyaneke nû ye, derxistina nanê devê xwe ye, şîrê spî ya ku ji xwîna dilê xwe dide çêkirin, rûmeta mirov e. Lê ya herî girîng, dayik azadî ye û rê nîşandana rastirîn e ji mirov re. Belê stêrkên li rûyên ezman û heyva buhara rengîn ya panzdeh rojî yê. Barana avrêlê û çiçekên darên meha gulane ye. Xemilandina gulistana mirovan e. Lê belê em bawer in ku ne tu mêjî û ne jî tu pênuş dikarin dayikê binin zimên. Lewre dayik sedema hebûna mirovan e.

Belê, dayik azadî ye.  
Her wisa jî dayik remza  
aştiya herî wekhev û  
jiyana hevpar e.  
Ew sembola kedê ye di  
civaka mirovatîyê de.  
Aştiya ku mirovan  
tê de jiyaneke serbixwe  
dijî, bi xebatê û bi kedê  
tê damezirandin.

Belê, dayik azadî ye. Her wisa jî dayik remza aştiya herî wekhev û jiyana hevpar e. Ew sembola kedê ye di civaka mirovatîyê de. Aştiya ku mirovan tê de jiyaneke serbixwe dijî, bi xebatê û bi kedê tê damezirandin.

Hetanî ax, tovekê xwedî dike û derdixe holê, di nava xwe de gir û bi hêz dike, tevî ku ji nava xwe avê û qûtê tove dide, lê li derva jî, li dijî xetereyên xwezayî bi rengekî dijwar li ber xwe dide. Ax ne bes tove di nava xwe de dide jiyandin, her wisa hemî derfetên jiyîna wî gihayî jî jê re amede dike. Yanê bê ax ne gengez e ku tu zindî bijîn. Dayikek jî rista axê ji zarokên xwe re dilîze. Lewra tê gotin, ax dayik e.

Dayik niştîman e

Dayik mîna axê û çiya sembola azadî û serfiraziyê ye. Çawa ku niştîman bi ava xwe bi sererd û bînerdê xwe zarokên xwe dide jiyandin, wisa jî dayik bi hêstirên çavan, bi nanê ku ji gewriya xwe dibire, zaroka xwe xwedî dike û bi ronahiya çavên xwe ji diparêze. Qet nehatiye gotin ku niştîmanan zarokên xwe li holê hiştine. Ji ber ku welat her dem

bi rengekî azad mîna dayikan zarokên xwe diwelidîne. Lê her dem jî hatiye ditin ku dema zarok li welat an li dayika xwe ya biçûk xwedî derneketine, ew kirine kole ji biyanan re.

Dayika mezin di bin lingên neyarên biyan de dike qêrîn, ya biçûk jî li ber destên wan dike nalîn. Lê wekî me li jor jî da nasîn, dayik sembola aştiyê ye. Di cewherê wê de zilm, zordarî, şer talan û kuştin nîn e. Ji aliyê din ve jî, hêvî hezkirin girêdana herî pîroz û parastina zarokên xwe jî tade û lêdana kesên biyan bi rengekî xwezayî di cewherê wê de heye. Yanê ji xisletên dayika ya sereke parastina zarokên xwe heye.

Di vê rastiyê de dema mirov li civaka Kurdistanê mêze dike, mirov dibîne

azadiyê di nav xwe de veşartibûn. Ji xurtbûna tovên azadiyê em dibînin bi destpêkirina şerê azadiyê re pir zû wê ew qeydên koletiyê şikandin û guhartinên binagehîn di nava xwe de dane çêkirin. Ji wan guhartinan îro bi hezaran dayik bi destê zarokên xwe girtine û wan dişînin nav refên gerilayan.

Rêveberiya tevgera azadiyê, "Bi qasî ku dayik pê serbilind bibin, me kar kiriyê." dibêje. Belê serbilindiya dayikan ji karmendiya zarokên wê bêhtir, êdî bûye cihgirtina di nav şer de. Ev serbilindî jî bûye pêşbaziyek di nav jinên Kurdistanê de. Berê dayikê şîrê xwe li zarokên xwe yên ku karên wê yên malbatî dikir û tola eşîrtî hiltanî helal dikir. Lê îro bi beşdariya nava şerê rizgariyê, bi rakiri-

pîroz di çêkirina warekî azad ku dayik bikaribe tê de bijî re derbas dibe. Lewre di jiyaneke koletî de ne gengaz e ku mirov behsa hezkirinek rast û durist bike. Eger hebe jî mîna serok dibêje: "Ew hezkirin xapandina hevdu ye, ne tişteki din e."

Çawa ku dijmin jiyana li me herimandibû, her wisa jî wî şîrê spî yê dayikên me jî li me herimandibû. Li welatê me di demên ku dijmin jiyana neherimandî de em dibînin şîrên dayikan jî nehatiye herimandin. Qehremanên mezin ji bo civakê û mirovatîyê derketine holê. Yanê bi gelemperî dayik qehremanan diwelidînin, lê qehreman jî dayikên xwe bi dinyayê didin nasîn. Mîna hemû şehîdên azadiyê û serokê neteweyî.

Belê, hemû xisletên mirovatîyê di navbera zarok û dayikê de încax di jiyaneke azad de pêk were. Di jiyana azad de jî ya ku dayik ji zarokê xwe dixwazin, bi kedê, bi xebateke dîr û di-



Dayê ez xatir ji te dixwazim  
Xwendin û zanîn em serfiraz in  
Nebêj kurê min bûye eşqiya  
dibim gerîla li çol û çiya  
dibim şeroşger diçim ser çiya

rêj, bi rijandina xwînê ji bo welat, bi fedekariyê û şerekî dijwar li dijî metingerê Kurdistanê tê holê. Lê çiqas mafê dayikan neyê dayin tê gotin, hinek be jî bi rizgarkirina welat û bi destxistina azadiyê tê dayin û bi vê xebatê şîrê dayikê li mirov helal dibe.

Di encamê de em dikarin vê yekê bêjin; pêkanîna daxwazên dayika şertê yekemîn e ji bo ku mirov bi serbilindî bijî. Hz. Muhamed: "Bihişt di bin lingên dayikan de ye", dibêje. Ev jî rast e. Lewre bihişt warê azadiyê û jiyana serbixwe temsîl dike. Girêdana bi dayikê ve jî ya rast bihiştê wisa ji me re dide çêkirin. Lewra mirov dixwaze di bihiştê de bijî, pêwîst e ku xebateke mirovatî bide kirin. Girêdana rast helalkirina şîrê dayikê ye. Îro di berxwedan û bilindbûna kesaniya mirov re derbas dibe. Ev jî bes bi pêkanîna xêza serokatîyê gengaz e. Şoreş kesaniyeka azad dide avakirin; dayik jî zayîna jiyaneke azad. Di şîrê dayikê de mîna ava di çemên welat de azadî heye. Heta mirov ji aya Munzur, Dicle, Ferat û Zapê vexwe, pêwîst e wan rizgar bike. Bêrizgarkirin dijmin şîr, av ba û hwd. hemû li gel kiriye jehr û gelê me dide fetisandin. Belê, şîrê di pêsîra dayikan de dikele, ava di çemên Mezra Botan de diherikin, dikine qêrîn.

ku, dayikên mîna Zarîfe û Besê berxwedanên mezin dane meşandin. Lewre di civaka Kurdistanê de ji hemû kesên civakê yên din bêhtir dayikan welatparêz di nava xwe de parastine. Di mandina zimanê kurdî de sedema bîngehîn parastina dayikên Kurdistanê ji adet û toreya kurdayetiyê ye. Lewre em dibînin êrişên dijmin li ser malbatê û bi mebesta qutkirina tîkiliyên pîrekên kurd ji civaka wê hatine kirin. Ji ber ku dijmin baş dizane, xerakirina ramanên jina kurd, xerakirina civakê û pêşeroja gelê kurd e jî.

Dijmin çiqas bi gelemperî bi ser ketibe jî, lê ji aliyê tunekirina kurdayetiya jina kurd de bi ser neketiye. Her çiqas rewş wisa be jî, jina kurd di mal de daye fetisandin. Ji fetisandina jinê di mal de. Ji ber tengbûna çeperên jiyana jina kurd bû sedema tengbûna asoya wê û lewre jî mebesta xwedikirina zarok bû ji hilanîna tola malbatê, girtina cihekî bilind di karê dewletê de. Wekî encama vê siyaseta dayik ji mîna zaroyên xwe bûn kole. Lê wê tovên azadiyê têda nehatabûn tunekirin. Wê jî, mîna çiya tove

na tola Şêx Seîd, Seyîd Rîza û hemû şehîdên rizgariyê tê kirin.

Dayikên kurd ne şerxwaz, lê pêwîstiya şer ji bîr nakin

Dayikên kurd ne şerxwaz in. Lê zanan ku bê şer ne dikarin hilma xwe bidin-bistînin, zarokên xwe xwedî bikin û ne jî dikarin namûsa xwe biparêzin. Ji ber ku bes şer bûya riya jiyaneke azad û serfiraz, heta dawiyê jî şer dixwazin. Ew baş dizanin ku dijmin her tişt bi şer û bi zorê jî dest kurdan girtine. Ji bo bi destxistinê jî şerekî pir dijwar pêwîst e. Ji bîra wan neçûye qelîşandina zikê bûkên Dêrsimê û sorbûna çemê Münzûr bi xwîna keçikên kurd.

Îro di Kurdistanê de zagonên mafên dayikan ev in; çiqas şerê rizgariyê û azadiyê bilind bibe, ew qas jî mafê dayikê tê dayin. Serok li ser vê babetê wîha dibêje: "Xelasbûna dayika mezin, xelasbûna dayika biçûk e jî. Kî dixwaze mafê dayikê bide û hurmetê nîşanê dayika xwe bide. Jê tê xwestin ku xwe li gorî şerê demdirêj amade bike û şerê xwe bi zanebûn xurt bike."

Hezkirin û hurmeta ji dayikê re herî

AHMED HUSEYİN



# Li aliyekî şer û ceng e, li aliyekî şox û şeng e

**L**i welatê me, ev 70-80 sal in ku xwîn dirije. Bi deh hezaran mirov (keç-xort-mêr-jin) hatine kuştin. Bi deh hezaran gund vala bûne û hilweşiyane. Di van 14 salên dawî de xwîn wekî lehiyê herikiye. Bi milyon kes koçber û penaber bûne. Lê ji ber ku tu kes û tu bûyer nikare xweşiya jiyane bisekinîne, li vî welaî hejar û bîndest, ku her roj tevkujî lê çêdibin, dîsa jiyane didome. Dîsa qiz û xort dizewicin, dîsa dawet çêdibin û bi sedan mirov dikevin destê hev û dîlanê dikin.

Gelo qey bandora tevkujîyan, bandora kuştinan li ser mirovên kurd çênabe? Belê, çêdibe. Lê dîsa dîlana xwe dikin. Tenê rewşa dîlanê tê guherandin. Dema şer, dîlan jî dibe wekî şer. Stranên li ser şer li dawetan tînin gotin û mirov wekî ku şer bikin, dîlanê dikin.

Mirovên ku herî zêde tahde û pêkûtî dîtine jî, dikevin dîlanê û dilizin. Ji ber ku hebûna xwe di vî dîlanê de dibînin. Kesayetîya xwe bi wî awayî li hemberî dijmin tekûz dike û wekî bi wê dîlana xwe, bibêje, "ez nemirime!"

Di pêvajoya şerê bakurê Kurdistanê de, carinan mirov li hin navçeyan an gundan dinêhere û mirov hin bûyerên ku li van deran çêbûne tîne ber çavên xwe, mirov dibêje qey sed salî şahî û dawet li van deveran çênabe û tu kes nema dawetan li dar dixê. Lê salek jî derbas nabe, tu lê dinêherî komên hunermendan, li qadan mirovan ji xwe dibin û serê dawetê û dawîya wê nexuyaye.

Mînak, li Qosera Mêrdînê, di salên

1992-93' yan de di kuştinên ku kontrayan çêkirin de, nêzi 50 kes hatin kuştin. Ji bilî şehîdên şervan, di her malbatê de şehîdek an girtiyek heye li vî deverê. Lê dawet û dîlan qet tiştêk jê kêr nebûye.

Helbet ev ji ber şerê azadiyê ye ku hişê mirovan guhartiye û ew bi jiyane ve hê pir girê dane. Mirovan li dawîya şehade-



tan, xwe wînda nekiriye û bi şehîdên xwe hê pir bi jiyane ve hatine girêdan. Ev yek guherînek mezin e.

A niha li Qoserê gelek komên hunermendan hene û bi stranên xwe gel dîloşînin. Yek ji wan Emîne Erbanî û Adilo ye. Ji bo ku mirov wan ji bo dawetekê zefî bike, divê mehek berê mirov dora xwe deynê ser.

Her çiqas kom û şexs ji bo diravan dixebitin û welatparêziya wan kêr be jî, dîsa bi pêwîstiya stranên kurdî, wan bi ser zimanê kurdî de dahf dide. Ji ber pêwîs-

tiya gelê ku bi stranên wan dîloşînin. Dema ku Emîne Erbanî strana "Şer şer e, îro li meydanê şer e" dibêje tu kes rûniştî namîne û dikevin dîlanê. Emîne Erbanî bi hînek stranên xwe yê taybet û herêmî jî xwîna mirovan germ dike, wekî strana "Gundê Erban"

"Gundê Erban gundê mino

Weylo weylo gundê mino  
Warê bav û kalê mino  
Wêran wêran gundê mino"

Bi vî strana gundê wêran jî gel dîlanê dikin. Ne tenê li Qoserê, li Nisêbînê, navenda Mêrdînê û li Dêrikê jî Emîne Erbanî di serê rêzê de ye. Li van deveran û navend û gundên din jî gelek kom hene.

Wekî li Amedê bi dehan kom hene û di dawetan de bi kurdî stranên dibêjin. Li Cizîrê, li Girêamo (Silopî), Şernex, Bismil, Êlîhê jî komên cur bi cur hene û giş jî, mecbûrî bi kurdî distirên. Jixwe zimanên

din pir pere nakin. Heta di dawetên ereb û tirkî de jî, pirî caran bi kurdî stran tînin gotin.

Carinan tu dinêherî di navenda bajêr de strana "Em li Botan dibezin, endamê ERNK'ê ne; Bi rêzanî dimeşin leşkerê ARGK'ê ne" bilind dibe.

Ji vî yekê jî tê fêhmîkirin ku, dawet li aliyekî tirsê jî hişê mirovan derdixê, li cîhekî ku herroj şer û kuştin hebe û ev strana bê gotin û mirov jî li ber dîlanê bikin tiştêkî balkêş e.

Li welêt, radyo û TV yê herêmî jî cîhekî taybet digirin. Ji bilî TV'ya MED'ê, bi dehan TV û radyo hene ku bi kurdî stranên diweşînin. TV'yên herî rastgir jî bi kurdî dibêjin û pêşkêş dikin. Wekî me got jî ber xwestina gel e û jixwe yê din pir pere nakin.

Îro li navenda Mêrdînê radyoyek heye ku stranên herî xweş pêşkêşî guhdarên xwe dike. Mînak strana "Adarê" rojê sê çar caran tê gotin di radyoyê de. Her roj awaza Xelîl Xemgîn li kuçe û kolanan bilind dibe. Gel jî bi vî yekê kêfxweş dibe. Ev yek jî, ji telefonên ku ji gundan tê kirin tê fêhmîkirin. Ev rewş helbet bi xwîne hatiye holê û dahfdana gel vî yekê tîne holê.

Belê... Carinan jî di şevên şahî û dawetan de; dengê stranên, dengê tembûrê û dengê çekan, dengê keleşan tevlihev dibin. Hinek bi çekan hinek jî bi tembûr û dîlanê şer dikin li welatê rojê... Li aliyekî şox û şeng e, li aliyekî şer û ceng e.

ÇIYA MAZÎ

## An yekbûn an têkçûn

FAYSAL DAĞLI



**H**ewldana tevgera rizgariya kurd ji bo yekîtiyê, encam çî dibe bila bibêje çêdibe dide mirov. Rêxistinên kurd piştî gelek ceribandinan, cara yekemîn pêvajoyeke wisa piraftî û perspektîfêke fireh bi dest xistine. Îro mirov dikare bibêje şertên yekîtiya kurdan kemilîne.

1- Rojhilata Navîn û cîhan ber bi hevêşê û îtîfakên nû ve diçin. Di vî warî de jeopolîtîka Kurdistanê her diçe giranbuhatir dibe. Çavkaniyên av û petrola me ji niha ve dibe navenda şerê parvekirinê. Rûsya û Almanya bi awayekî aktîfîst dest davêjin herêmê. Di keftûlefa li ser çavkaniyên herêmê de wê hemû alîgir bi mihraqên xwedî hêz re, helbet bi kurdan re jî têkiliyê deynin. Ji aliyê din ve gengeşiyên navkolonyalîstan her diçe zêdetir dibin. Ev çewtî ku ji aliyê hêzên kurdan ve jî tê xwedîkirin, wê di pêşerojê de statûkoya navkolonyalîstan xera bike. Dîsa pirsgerêkên navxweyî yê dagirkeran her diçe tûj dibin. Enqere û Baxdat di warê rêveberî û aborî de tek çûne. Pêşeroja Tahran û Şamê jî ne zelal e.

2- Şerê rizgariyê, potansiyela kurdan derxistîye meydanê. Kurd êdî hêzeke ku ji aliyê hemû cîhanê ve tînin hesibandin û naskirin in. Giraniya me ya stratejîk ji herêmîbûnê ber bi navneteweyîbûnê ve diçe. Di vî pêvajoyê de kurd di nav xwe de jî zelal û diyar bûne û reş û spî ji hev qetiyane. Li Başûrê welêt bi destxistina desthilatiyê, asta welatparêziya wan hêzên jî derxistîye holê. Di encamê de hat fêhmîkirin ku Mesûd êdî ne li alî kurdan e. Û êdî nedaxilbûna wî ya hewldana yekîtiya neteweyî jî ne pir girîng e. Li Kurdistanê bi qasî yekîtiya neteweyî, pêşeroj heye. Hemû hesab, hevkarî, deng û îhtîmal bi yekîtiya neteweyî ve giredayî ye. Encama yekemîn û yekbûnê têkberîna îxanetê ye. Dagirkeran heta niha bi saya xayînen Kurdistanê di dest de girtine. Kurd tu car li meydanên şer tînin neçûn. Musebibê vî serpêhatîya bi lanet xayînen me û toleransa me ya li hemberî îxanetê bûye. Kurd vî qedere ancax bi yekbûnê dikarin biguherînin. Ji ber vî yekê hewldana dawî ji bo pêşeroja neteweya me pir girîng e. Di vî rewşa dijwar û firsenda zêrîn de jî tê dîtin ku hinek komik, bi demogojîyê, erzana xwe ji yekîtiyê dûr dixin. Mehkûmkirina wan a di wîcdanê gel de wekî aciliyeteke dertê holê. Ê ku ji yekîtiya kurdan direvin ne dostê kurdan in. Ji ber van derewên wan û flûrta wan a bi xiyanetê re pêwîst e bê teşhîrkirin.

Yek ji van komikên ku xwe dîrî pêvajoya Kongreyê Neteweyî dikin bahaneyê ecêb, dibêjin: "Li Başûr di nav rêxistinên kurdan de şer didome. Loma daxilê vî pêvajoyê nabin!" Çî sextekariyê mezin ji bilî hêzên Mesûd hemû

hêzên ku di şerê Başûr de ne daxilî xebata kongreyê bûne. Mesûd jî niha rê nîşanî tanqên tirkînan dide. Û jixwe yek jî amanca kongreyê ne sekîndina vî şerî ye? Ê baş e, gelo komik ji Mesûd wisa hez dikin an wî bi kar tînin? Em dê bibînin. Berî salê 1980'yan ev grûb mîsyonerê rejîma Moskowayê (ya li Kurdistanê) bû. Heman grûb di wê demê de Mele Mistefayê serokê berxwedana Başûr, ji ber ku ji rêveberîya Amerîkayê re name şandibû "xayîn" îlan kiribû. Lê dîsa Mesûdê ku li tanqên tirkînan ereban siwar bûye îro jî gunehên wî paqij dikin. Çî bû? Vê bersivê jî emê piştî diyarbûna helwesta rejîma Bonnê ya li hemberî yekîtiya kurdan, bîstînin!

Pêşniyara Dr. Nûrî Talabanî a ji bo dadgeheke neteweyî li cîh e. Lê ji niha ve jî tiştên ku bînin kirin hene. Li dijî sabotarên Kongreyê Neteweyî lazim e ji niha ve hin tedbîrên bînin standin. Di gava yekemîn de mirov dikare bang li wan kesên endamê van gruban in û heta niha hezkirina xwe ya welatê û neteweyê wînda nekirî, bike.

Ew bila an siyaseta şefên xwe biguherînin an jî derbas bibin nav refên welatperweran! Dîsa hemû sazîyên Kurdistanê û welatparêz çawa ku bi xayînan re têkiliyên xwe birîne, dikarin bi van re jî têkiliyên xwe qut bikin. Heta ku ew helwesta xwe ya dijîtiya yekîtiya neteweyî rawestînin, gel dikare li ser wan ambargoya wekî li dijî korici/caşan deyne. Û dîsa tu kes ne xwedî wî mafî ye ku ji wan re toleransê nîşan bide. Mafê tu kesî tune ye ku xeyala me ya sedan sal, xeyala yekîtiyê xera bike. Kurd an wê bibin yek û bi ser bikevin an jî wê ji hev biqetin û tîk herin!




## Zanakarê şarî, Şoreşkar

## Ali Aslan

**T**eberdê welatî de gird-biyayin, milê kesî keno kilm û zerya kesî keno tenik. Eke qandê çiçi beno wa bibo, xerîbîn, riçikê merdiman bêwayir veradano. Welatperwerîn ra nêbo; kes xerîbîn de beno reben, beno bêhes û beno tersonek. Kes her tim xo bi xo re wina vano: "Şewra biro ezo ageyrî, tayna xover bide, wextî ra zaf raverd, taynekê mend." Merdim şew roj kewno kaxidê ageyrayinî. Eke no kaxi jî nêbo, kes nêşeno pay de jî bimano. Dewleta Roma reş hîrê sey serî yo ke, ma kurdan welatê xo ra qeymenê çahar kiştê dinyayî. Ma çend ke welat ra dûrî kewnê, hind jî vinî benê. La belê şoreşê ewro, şoreşê reyayinê şarê Kurdistanî yo ke newe wo, teberdê welatî de jî xeftiyayino gird dano û ney qaydî kok xilneno. Cokra şoreş, welat de û teberdê welatî de hergî roj berz beno. Hîrê sey serî yê ke kurdî Çûkûrova de vinî biye. La belê ewro, kurdî Çûkûrova kenê herema kurdan. Nay ray de embaz Elî Mêrsîn de zaf ariqyê û zaf cefa dî.

Adna de ma pê silasna bi. Mêrsîn ra hîrê embazê xo, ya ame bi rojnameya Yeni Ülke. Ma bûroya rojnamî newe akêrbî. Cok ra welatperwerî ameyê ziyaret ke zerî bidê ma. Ma jî nê ziyaretan ra zaf paştî girotê. No ziyaret silasnayinê min we û embaz Elî rê bi wesîle. Ho Bismîl ra bi û bahdoyê dest didinê îlonî (rezber) de amêbi Mêrsîn. Embaz Elî piyê panc lacekî bi. Lacê ci yo werdî bahdoyê şahadetê ci, amê dinya û namê piyê ci pa kerdî. Ho çend serî jî bazarê mehlan de xeftiyê. Aleqeyê ey HEP û ÎHD estbi. Nê rayfistenan (rêxist) miyan de verpersîn kerdî. Mêrsîn de welatperweran miyan de merdim wo silasnaye bi. Wexto ke a şaristan de teşxeleyê vejyayê, ma ey ra paştî girotê. Embaz Eliyî zaf weynayê xo ra, çinayê ci tim û tim utikerde bi û qirawat jî, ci ra kemî nêbiyê. Ey weşîna xo, kok ra dayê ecibnayin.

Mêrsîn de çiçi ke biyê, polîsan sifte o tepîştê û binçiman de tahde dayê ci. La belê ey herfî fin, şarî miyan de rûmetê xo tayna berz kerdê. Cok ra dişmen xînt biyê. Rojê polîsî ci rê wina vanê: "Ma to ya heyiryayê, qandê çiçi ti nêşinê welatê xo û nêvejyênê koyan? Ek ti camêrd ê, koyan de bivejyê verniya ma." Elî na qise sero wiyeno û wina vano: "Raşt o zerya mi tenik a, la belê şima hergî roj zerya mi kenê metîn. Çi rê ke ma şima ra biratey, ancî şima ma ra dişmenatey



wazenê. Ma se kerê, wina jî beno." Senî ke o winî vano, dişmen a roj heta şan dan piro. Kotekan ra ganê ci beno zey pilolî. Astayê ci, zey teliyan kewno goştê ci miyan. Eke raşt yeno min vîrî sero 1989'in de fina kewno binçimî û nezdiyê pancas rojî îşkencexanî de maneno. Ney vardayinî de dişmen Mêrsîn de tahde wo gird dano şarê kurdan. Qeçekî cinî û zaf ciwanî tepîşyenê. Îşkencexanê qîrîn ra lerzeno. Polîsan rûmetê mardimana kay kerdê û waştê ke rûmetê înan bidê lîngan bin. La belê îşkencexanî de

vengê Embaz Elî wina vila biyê: "Rûmet paymendin do. Wa ewro, rûmetê dişmenî ewtiyad warkew wo. Eke ma xoser de bimanê, mayê vardayinê dişmenî veng veradê. Kotekê dişmenî bêminet o. Wa nê kotekî ma rê bibê, waştina heyfê şoreşî." Bahdoyê binçimî, embaz Elî tepîşyê û kewt zindan. Zindan de çend mengî mend û viradyê.

Weşîna metropol, merdimî rew herimneno, eke şoreşkeran ra dûrî vinderî. Çi rê ke, rewşê debarê kêyan zaf xerab o. Qiyemetê ariqîna karkeran

zaf ercan o. Cini qeçekî û camêrdî xefteyênê nêxeftenyênê, nêşenê heqê nanê xo vejê. Erdan de penî arêdanê, şinê çapê mewe akêdanê, banan virazenê, kuçan de çi roşenê, sewlan boyax kenê, simitî roşenê kê zengînan de xulamîn kenê û zewbî karan de şew roj xetyênê, la belê fina jî veşan û teşan manenê. Embaz Elî û malbata ci nê karan heminde jî xeftiyayî. Embaz Elî na weşîna giran miyan de wendin ra jî dûr nêkewt. Ci dest ra çend ke ame, xo da karê wendine û heya lîse wend. Na kişt ra jî, embazanê xo miyan de hezkerde bi. Ey kiştê ra wendbi û kiştê ra jî qandê weşîna xo karkerîn kerd bi.

Rojê amê, zerya ci kewt keynek û pa zewciyê. Ey û ciniya xo qeçikan ra bol hez kerdê, qandê co pêsero panc qeçekî viraştî. İnan rê hergî fin jî lacek bi. Wexto ke embazan ci rê vatê: "No çi hal o, mayê nê qeçikan serkî. Eke wina şiro, kê (keye) to veş a. Tiyê nînan senîn mird kirî." Nê kuşatan sero Elî wiyayê û wina vate: "Mayê şoreşî rê xeftiyênê. Wa şoreş înan mird kero. Eke wina şiro, ma ra jew bulik vejyeno." Qandê lacê xo wo gird Mahsûmî jî wina vatê: "Fermadarê bulika ma jî hadrê wo, lacê min û embazê min Mahsûm o." Ey qeçanê xo ra zaf zerî girotê. Û inana bol kêfweş biyê. Wexto ke, qeçanê xo sero qisey kerdê, kêf ra perayê. Embazan jî ci rê vatê: "Raşt o embaz, kê şima nika ra biyo bulika partî. Raporan birişê ke, wak partî waştinê şima biyaro ci." Nê seran de malbatê winayinî zêde benê. Çirê ke şoreş hergî roj, şarî miyan de berz bena û rûmet gêna. Cok ra keyan miyan de riçik erzena.

Embaz Elî sera 1992'in de, Çûkûrova ra şî û tewrê gerîlan bi. Çi heyfo ke gerîlan miyan de veşî nêmend. A ser miyan de sera 1992'in de roja 12'in de kewçêr de şaristanê Cizîre de, dewa Kûrtûlûş de, fermadar Şiyar (Kazim Kulu) û des embazê xo ya şehîd kewt. Şahadetê nê embazan, şarê Cizîre û şarê Dêrsim ardbî pê hetek. Çimke şehîdê na kom, zêdetir Dêrsim ra biyê. Şarê ma wo Cizîre şehîdanê xo rê wêr vejyayî û berdî Dêrsim. Nezdîyê hezar merdin şehîdanê xo ya şîbi. Şarê Dêrsim, aleqeyê şarê Cizîre ra zaf kêfweş biyê û pê re wina vatê: "Kurdistan jew a, kurdî jî jew şar o. Wa dişmen ney bizano. Alewî, sînî, kurmanç, dimilî, ma heme jî jew ê. Wêşêr bo jewina ma!" Wa wêşêr bo şehîdê ma hemîn rê!...

ZÜLKÜF KIŞANA



## Qetlîama Mereşê

Roja 19 berfanbarê bi bombekirina Çiçek Sinememasiyê bû destpêka qetlîama Mereşê. Faşîstên ku bi şîaraku kî alewiyekî bikuje wê here cinetê, li pênc taxên ku alewî dijîn ji berê ve ku hatibûne kifşkirin êrîş birin ser taxên alewî û sûniyan. Piştî ku êrîşae di 25'ê berfanbarê de xilasbû de 111 kes hatin kuştin û bi sedan kes jî birîndar bûn, 210 deh mal 70 cihên kar hatibûn hirweşandin. Bi hezaran alewî ji ber qetlîama faşîsatan ji Mereşê koçber bûn. Piştî qetlîamê hikumeta CHP li 13 bajaran Rewşa Awerte îlan kir. Xwestin ku vê

## BÛYERINE JI DÎROKÊ



bûyerê wekî pevçûna çep-rastan nîşan bidin. Nivîsakarê Rojnameya Tercumanê Ahmet Kabaklı ev tevkujiya ku li hemberî alewî û şoresgeran wekî ku 'hespeke siwarê xwe naecibîne çawa radibe şek bi nav kir.'

□ 24 Berfanbar 1981 Doza DISK'ê

24 berfanbar 1981 li Dadgeha Stenbolê ya Leşkerî di pêvajoya doza DISK'ê de ji bo Abdullah Baştürk û 50 hevalên wî îdam hate xwestin.

## Ji NÇM'ê awazeke nû:

# Hozan Leman

Ji roja ku NÇM'ê ava bûye û bi vir de gelek komên muzîkê û hozan gihîştandin. Bi giştî komên muzîkê û hozanan stranên kurmançî gotin û dibêjin. Zaravaya kirmançî (dimilkî), yan ji ber nebûnê an jî ji ber hin sedemên din zêde derneketin pêş. Di reper-tûara koman û hozanan de bi zêdeyî yek an jî du heb stranên dimilkî cihê xwe digirtin.

Di van demên dawîn de komeke dimilkî bi navê "Vengê Sodi-rî" dest bi xebatên xwe kir. Bi giştî ev kom li ser zaravayê dimilkî radiweste û stranên dimilkî pêşberî gel dike. Her wiha vêga jî hozanek bi navê Leman derdikeve pêşberî gel. Di rewşa îroyîn de jin bi gelek awayî nikarin xwe biparêzin an jî xwe îfade bikin, xuya ye ku NÇM'ê ji bo vê yekê sînga xwe vekirîye. Wekî li jorê hate diyarkirin, taybetiyeke din ew e ku ev hozan bi zaravayê kirmançî stranên dibêje.

Hozan Leman li NÇM'ya Îzmîrê xebatên xwe didomîne. Roja yekşemê (13.12.1997) hate Stenbolê û li navenda NÇM'yê konserê da. Di konserê de nêzî 20 heb stran gotin. Bi giştî stranên wê bi zaravaya dimilkî bûn. Hozan Leman berê di nav komeke NÇM'ya Îzmîrê de solistî dikir. Piştî ku kom belav dibe ew jî bi serê xwe lê bi muzîkeke pir-dengî derdikeve pêşberî gel. Li Stenbolê yekemîn car e ku konserê dide. Her çiqas Hozan Leman di warê hunermendiyê de nû be jî, roja ku li NÇM'ê konser da temaşevan gelekî di bin bandora xwe de hiştin.

Hozan Leman ne bi awayekî nû, lê bi şeweyekî ku zêde ji aliyê gel ve nayê zanîn an jî, guhê gel ji wê şeweyê têr nebûye, bi kar tîne. Hemû dengê stranên wê ji dil û hinavan, bi şeweyekî otantik ku taybetiyeke wê heye, carina stûr û carina jî zîz, ku di mêjiyê temaşevanan de olan dida, pêk dihat. Hozan Leman ne bi tenê tembûrê bi kar tîne, tevî tembûrê bas gîtar, bilûr û ritmê jî bi kar tîne. Cur bi curiya wan amûran jî cihêrengiyeke din destnîşan dida hunera wê. Ji stranên ku hozan Leman di konserê de gotin pênc heb yên wê bûn.



### Divê çepera mûzîka dimilkî fireh bibe

Piştî konserê me li ser mûzîka dimilkî bi Hozan Leman re sohbeteke pêk anî. Di sohbete de ji axaftina Hozan Leman ew derdiket ku, dimilkî di warê muzîkê de gelekî teng e. Hozan Leman tengiya wê jî bi tenê bi aliyekî de çûyina wê ve girêdida. Li gorî Hozan Leman, divê kirdkî (kirmançî) xwe hê berfirretir bike û ew, wekî pêşniyaz jî pirdengiyê dest nîşan dike.

Her wiha Hozan Leman dide zanîn ku, ji bo ku pirsên gel bîn bersivandin divê muzîka kirmançî ji qalibê ku aniha tê de ye derkeve. Ji aliyê din ve bi dîtina hozan Leman, bi vê riya ew kurdên alewî jî tevî xwe dikin. Lewre dema li wan guhdarî dikin dikarin xwe di nav stranê de bibînin. Ji aliyê din ve Hozan Leman diyar dike ku ewê bi giştî stranên polîtîk bibêje, otantîzmê zêde dernaxe pêş.

SERWISA ÇANDÊ

## ÇAVDÊRÎ

### Li Tirkiyeyê dîrok, huner û siyaset



MÎRHEM YIÇIT

Rewşenbîrên bikêr û objektîf malê her kesî, her welat û her xelkî ne. Têne xwendin û ji hezkirina giştî û navneteweyî tiştek li pişka wan dikeve. Şerên nav "neteweyan" û çavsoyî "neteweyekê" li yê din vê rastiyê naguhere.

Beşek kurdên ji Bakur tene navê Haldun Taner bihistine teqez. Ez bi xwe nivîsên wî dixwînim. Ew ji bo naskirina mentalîteya mirovên tirk dibin alîkar. Heta bi cihê objektîf in, înfomatîv, dewlemend û zimanxurt in;

"Li welatê me her hikûmeta ku tê, bi navê dîrokê hîn çîrokan ji me re dibêje û ji me dixwaze ku em van çîrokan wekî tarîxê qebûl bikin. Dema me lîsê dixwend Saziya Dîrokê ya Tirk (Türk Tarih Kurumu) ji bo xwendinê berhemêke çarcildî amade kiribû. Me pişt re nas kir ku ew tarîx ne objektîv e, çend kesan li gorî kêfa xwe nivîsiye. Bi taybetî cildê çaran ku li ser Şerê Rizgariya Neteweyî bû, bi temamî yekalî û tîjî nerastî bû."

"Ji zemanê Evdilhemîd heta niha dîtina wan çî be bila bibe desthilatdarên Tirkiyeyê li cihêkî pêrgî hev dibin, mîna hev in" û ferqên di nav wan de radibin. Çi ye ev pêrgî-hev-bûn û wekî-hev-bûn?

"Ji netewe re her tiştî nabêjin, tiştan jê vedişêrin. Vê dibêjin: "Tiştên ku netewê zanibe û yên ku nizanibe em tesbît dikin. Pêwîst be derew jî tene kirin û derew bi xwe ji meşrû ne." Desthilatdarên tirk ji duh heta bi îro li xelkê mîna zarokêkî balixnebûyî dinêrin. Vî zarokî carina bi xeqandinê, carina bi tîrsê û carina jî bi haşkirinê perwerde û îdare dikin." (Hak Dostum Diye Başlayayım Söze R:37-38). Çend tişt jî derbarê huner û muzîkê de:

"Gulana 1975'an du besteyên ku ji bo musabeqeya Eurovisionê hatibûn amadekirin ji ber ku ji Ewropayê hatibûn dizîn ji lîskê derxistin."

"Helbesta Yahya Kemal Gemiyên Bêdeng bi besteyeke franstî tene stîran. Bi besteyên Îsraîliyan hin bûne bazirgan. Niha ji piştî salên 70'î erebesk popûler bûye."

"Dağ başını duman almış" straneke swêdî ye. Eslê wê wiha: "Sê qîzên xort derketibûn seyranê/ Baran hat/ Xemlên wan şik-kirin/ Roj ji rojhilat hiltê/ Besta zîvîn diherike. Hema bêje ev bûbû "Marşa Neteweyî ya duhem."

"Filmên Yeşilçamê ji %75 ne bi rengekî wiha sergirtî, veşartî û pêlîstî, lê bi temamî bê biçûktirîn guhartin, ji xeynî çend navan naqilkirina filmên biyan in." Nimûneyek jî li ser siyasiyên dewleta tirk û parlamentoya wan:

"Li Enqereyê min riya xwe bi meclîsê xist. Parlementerên ku partiyên xwe guhartine milên xwe xistibûn milên hêmpartiyên xwe yên nû û piyase dikirin. Ne bi min û ne bi te, qet pozê wan ji pedîşewitî. Em dê bîn çî? Stranên me yên diziyê, filmên me yên diziyê, rejîmên me yên diziyê, fikarên me ne yên me ne. Bivê nevwê parlementerên me jî dê mîna her tiştî me bin."

Haldun Taner salên 1975'an ev tişt nivîsandine. Niha piştî 22 salan siyasi, hunermend û rewşenbîrên tirk çend hezar carên din bêşermtir, sextekartir û paşverûtir bûne. Lê meyleke ku duh qels bû îro xurt dibe jî heye. Ev jî Beşikçîtî ye. Beşikçîtî ji duh bihêztir e û dê damara mohra xwe li dîroka rewşenbîrên tirk bide, tiştê ku tirk ji ber şerm nekin û pêspenê xwe bidin dê ev damar be.



## Mamosteyê Beşa Têkiliyên Navneteweyî ya Zanîngê

## PKK wekî dewlet

**Ma sedema xurtbûna ÎRA, PKK û ETA bi tenê belengazî ye?**

◆ Bêguman, di bingeha bûyer û diyardeyê de bi tenê belengazî û bindestî tune ye. Lê, di bingeha hemû tiştan de aborî cih digire. Warê siyasî jî xwe li warê aborî tîne.

**Wekî mînak, herêma Baskan li Spanyayê herêma herî bipêşketî ye lê dîsa jî têkoşîneke neteweyî heye?**

◆ Li herêma Baskan jî sedema bingehîn rewşa aborî ye. Ji ber ku li herêma Baskan, Bask ketine statûya hindikahîyan. Ji ber ku koçerên Spanî bêhtir ji kaniyên herêma Baskan yên aborî sûdê werdigirin, lewre jî baskî dixwazin dewleteke serbixwe ava bikin.

**Baş e. Ku îro rewşa aborî ya kurdan bi pêş bikeve, wê dev ji daxwazên xwe yê neteweyî berdîn?**

◆ Na, lê wê daxwazên kurdan tûjiya xwe winda bikin. Wekî mînak rewşa Qubecê. Qubecî niha dibêjin: "Wê çanda îngilîziyan çanda me bihelîne." Ji vê yekê ditirsîn û dixwazin ji Kanadayê veqetin. Berî vê bi 50 salî jî ber sedemên aborî dixwestin, veqetin lê niha ne wisa ye. Ji ber ku belengazî û hejarî jî holê rabûye.

**Lê, li gorî dîna desthilatdarên Tirkiyeyê sedema kêşeya kurdan rewşa aborî û feodal ya herêmê ye?**

◆ Di bingeha kêşeya kurdan de ev giş jî hene. Tiştê ku hikûmet dixwaze hîn bibe ev e: "Gelo ku em rewşa aborî ya herêmê bi pêş bixin, wê çi bibe?" Ji ber ku ji niha ve em nikarin bibêjin ku, me ji aliyê aborî ve problem çareser kir, wê rewşê baş be. Pêşîn divê problema belengazî û hejariyê bê çareser kirin. Ji ber ku li Tirkiyeyê bajarên herî feqîr Riha û Diyarbekir in.

**Heke hûn PKK, ETA û ÎRA'yê bidin ber hev dîmeneke çawa derdikeve holê?**

◆ ETA û ÎRA jî ber ku biçûktir in, li gorî PKK, bêhtir profesyonel in. Li aliyê din PKK rêxistineke mezin e. Ji ber vê yekê barê PKK girantir e. Wekî mînak heke du hezar milîtanên ÎRA yê hebin, ji van 500 heb çalak û aktîf in. Her wiha ev kes meaşê distînin. Lê bi hezaran milîtanên PKK'ê hene. Xwedîkirin û rêveberiya wan karekî gelekî dijwar e. Li aliyê din li Rojhilata Navîn birêvebirina rêxistineke wiha bêhtir zehmet e. Ji ber ku Rojhilata Navîn avzêlkek e.

**Gelo artêşa tirk jî ne di nava vê avzêlkê de ye?**

◆ Tirkiye dikare xwe ji vê avzêlkê bide alî. Lê, ji ber ku li bakurê Iraqê (başûrê Kurdistan) di warê desthilatdariyê

de valahiyek heye, ev herêm jî bo hemû rêxistin û dewletan avzêlkek e. Piyekî Tirkiyeyê jî di nav vê avzêlkê de ye.

**Tê gotin ku, wê axên kurdan yê Tirkiyê û bakurê Iraqê bîn yek-kirin û bi vî awayî jî dewleteke kurdan were avakirin?**

◆ Ev projeya Apo ye. Wekî mînak Serhat Bucak dibêje, Apo dixwaze li Rojhilata Navîn federasyoneke damezrîne. Lê armanceke wisa ya Êşîra Barzanî tune ye.

**Hûn dikarin PKK û rêxistinên kurdan yê din rûberî hev bikin?**

◆ Berî her tiştî YNK û PDK ne rêxistinên neteweyî ne. Ku yek ji para petrolê %5 bide wan, dikare %95'ê din ji wan bistîne. Lê PKK rêxistineke neteweyî ye. Ango tevgerek neteweyî ye û ji hemû çînan mirovan di nav xwe de dihewîne. PKK di vî warî de jêhatî ye. Lê YNK û PDK ne xwediyê vî taybetiyê ne.

**Çebû, Mahir Kaynak dibêje ku PKK li bakurê Iraqê partiya herî xurt e...**

◆ Belê, ne wisa bû, lê niha wisa ye. Lê astengiyek li ber PKK heye. Ew jî Barzanî ye. Ji ber ku rêxistinên wekî PDK û YNK xwedî siyaseteke demdemî ne.

**Hin derdor dibêjin PKK bi zanebûnê jî warê leşkerî vekîşiyaye û giraniya xwe dide warê siyasî. Hûn vê yekê çawa heldisengînin?**

◆ Jixwê ev demeke dirêj e PKK hem di warê neteweyî û hem jî di warê navneteweyî de dixebite. PKK ne rêxistineke jî rêzê ye. Xwe wekî dewletan saz kiriye û wekî dewletan jî dixebite. Wekî mînak mirov dikare Mustafa Karasu wekî çîgirê serokomarekî bi nav bike.

**Hûn xebatên diplomatîk yê kurdan çawa dinirxînin?**

◆ Kurd di warê diplomatîk de bi serketî ne. Heke ji terorîzmê xwe bidin alî wê bi serkeftî bin. Tiştê ku winda bikin jî, wê ji deh hezar milîtanan hezar milîtanê bimînin. Lê ne xem e...

**Bi baweriya we hikûmet dixwaze kêşeya kurdan çawa çareser bike?**

◆ Hin gavên avêtin. Wekî mînak qala destûrnameyê nû dikin. Ev jî 'Belgeya Siyaseta Neteweyî'. Lê em nikarin bibêjin çareseriyê berbiçav û misoger li ber destê rêveberên dewletê heye.

**Baş e. Bêyî PKK çareseriyê kêşeya kurdan mîmkûn e?**

◆ Ev girêdayî Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Heke PKK girseya xwe bika-ribe di dest xwe de bigire, dikare bibe

aliyekî çareseriyê. Ji ber ku bêyî şer xwedîkirina van milîtanan dijwar e. Ji ber ku wê ev milîtan bibêjin, em ji bo şer hatibûn. Lê dîsa jî em nikarin tiştê berbiçav bibêjin. Ji ber ku helwesta Öcalan ne diyar e. Û Öcalan jî her tiştê PKK diyar dike. Bêyî Öcalan wê PKK bela wela bibe.

Dibe ku, siberoj helwesta xwe biguhere û were meclîsê siyasîmedariyê bigere.

ya re ketibû pêşbaziyê. Lê bi ser neketin. Ji ber ku bêyî Îran û Tirkiye kes nikare li Rojhilata Navîn tiştê bike.

**Operasyonên li ser bakurê Iraqê çiqas li dijî PKK ne?**

◆ Wekî diyar e, êdî welatên rojavayî jî operasyonên li ser bakurê Iraqê aciz nabin. Ji ber ku tiştên ku dixwestin ji Tirkiye peyda kirin û dikin. Ku siberoj Suriye jî wisa bike, heman tişt li ser rîya

✓ PKK ev demeke dirêj e di warê neteweyî û navneteweyî de dixebite. PKK ne rêxistineke jî rêzê ye. Xwe wekî dewletan saz kiriye û wekî dewletan jî dixebite. kurdên nû jî bo dewlet û civaka tirk jî baştir û erênitir in. Sistema feodal bi giştî rêk çû. Ev qonaxeke pêşverûtir û baştir e. Bêguman Partiya Karkerên Kurdistan rêberiya vî karî kir.



**Li ser çareseriyê kêşeya kurdan Tirkiyê û DYA li hev dikin?**

◆ Heya destpêka sala 1997'an Rand Corporation dixwest li bakurê Iraqê dewleteke kurdan ava bike, ji Tirkiyeyê jî beşek xak di nav vê dewletê de hebû. Di vî warî de Rand Corporation piştigiriya Özal dikir. Lê di van rojên dawîn de, di Middle East Journal de nivîseke wan derket. Di vî nivîsê de tê diyarkirin ku, Tirkiyeyê xeletiyê gelek mezin kiriye û şansekî mezin bikar neaniye. Ev jî di de xuyakirin ku, DYA dixwaze, li Rojhilata Navîn dewleteke kurdan ava bike. Ji bo vê yekê bi Celal Talabani ve li hev kiribûn. Lê Barzanî li dijî vê yekê derket.

**Çebû. Ma di navbera DYA û welatên ewrûpî dubendiyek heye?**

◆ DYA û welatên ewrûpî di vî warî de ketibûn pêşbirkê. Bi taybetî bi Elman-

PKK'ê ye jî. Lê Mustafa Karasu di vî warî de zana û agahdar e. Mirovekî gelekî jîr û zana ye. Ku hûn bi wî re biaxivin wê tiştên gelekî baş ji we re diyar bike.

**Dîsa li Kendavê (Xelîc) DYA û Iraq li hev nakin. Çima?**

◆ Ev jî bo ewlehiya Îsraîlê ye. Ji ber ku Îsraîl jî guherînan ku li Îran û Iraqê pêk tên, ditirse. Ji bo welatên rojava tiştê girîng ewlehiya û parastina Îsraîlê ye. Tirkiyê zêde ne girîng e.

**Li aliyê din DYA, Îsraîl û Tirkiyeyê hevalbendiyek damezrandin?**

◆ Tirkiye bi darê zorê beşdarî wê hevalbendiyê bû. Wisa kirin ku têkiliyên Tirkiyeyê bi hemû ciranên wê re xera bibin. Xwestin li dijî Îranê hevkarîyê bikin. Ji bo vê yekê li dijî Tirkiye Îranê sor kirin. Tirkiyeyê jî ji ber bêgaviyê di nav



# Stenbolê Emin Gürses: teke ye

vê hevalbendiyê cih girt. Tansu Çillerê xwest ku em li dijî Îranê şer bikin. Özal jî gotibû, divê em li dijî Iraqê şer bikin. Lê Xwedê negot erê!

**PKK dikare tesîrê li hevkeşeya Rojhilata Navîn bike?**

⇒ Belê, tesîrê lê kir. Şoreşa hêrêmî îdi-ayeke PKK ye. PKK li Rojhilata Navîn aliyek e. Li layê din ku bixwazin Îran û Tirkiye dikarin bakurê Iraqê bela wela

yan berz û bilind kiriye.

**Lê, ji bo vê yekê gelek mirov hatin kuştin û kesayetiya mirovan pelîş...**

⇒ Ev tiştêkî asayî ye. Ger li ku derê serhildanê hebe, mirov tên kuştin. Her çiqas ne baş be jî tiştên wisa diqewimin.

**Ma divê perwerdehî bi zimanê zikmakî nebe?**

⇒ Ji bo perwerdehiya bi zimanê zikmakî divê gelê herêma biryara xwe bide.

**Gelo şansekî wan, bi vî rengî heye?**

⇒ Mesela ez ji Rizeyê me û lazim lê ez dixwazim bi tirkî an jî îngilîzî perwerde bibim. Ez dixwazim hîmî zimanê ku bi kêrî min be, bibim.

**Lê mirov dikare laz û kurdan bike nav heman çarçoweye?**

⇒ Na, ez li dijî perwerdehiya bi zimanê zikmakî me. Tu kes li dijî vê yekê dernakeve, ji bilî siyasetmedaran. Li layê din pîvanên netewebûnê tune ne. Tarîfa neteweyan heye.

**Li aliyê din nûnerên gelê kurd di nav meclîsê de tune ne?**

⇒ Ez li dijî binavkirinê nûnerê gelê kurd, gelê laz û gelê gurcî me. Divê mirov bê parastin, ne etnîsîte. Tiştê girîng ferd e. Divê nûnerên herêma û bajaran hebin. Lê kêmasî û çewtiyên PKK'ê jî bûn sedema tiştên ku hatin serê mebûsên kurd.

**Baş e. Gelo civaka tirk ji bo dayîna mafên kurdan amade ye?**

⇒ Kes mafê kesî nade kesî. Ev tiştêkî xelet e. Civakek dikare mafên xwe bi xwe bi dest bixe. Bêyî tekoşin maf nayê standin.

**Mahir Kaynak dibêje ku PKK dikare li Tirkiye şerekî navxweyî bide destpêkirin. Lê nake. Ji ber ku ne tevgereke neteweperest e. Hûn jî dibêjin PKK neteweperest e?**

⇒ Di nav tevgerên kurd de, bi tenê di nav PKK'ê de giraniya motifên neteweyî heye. Di destpêkê de giraniya motifên sosyalîst hebû, lê îro jî hemû çînan mirov di nav PKK'ê de cih digirin.

**Baş e. Neteweperestiya PKK'ê ber bi şovenîstbûnê ve diçe?**

⇒ Na, bêhtir bi aqil û bi mantiq e. Ne şovenîst e. Mirov nikare ji sedî sed PKK'ê wisa bi nav bike. Ev xeletiyek e. Wekî mînak mirovên wekî Mustafa Karasu û Serhat Bucak xwedî raboriyêke marksîst in. Ji ber vê yekê di bingeha politikayên wan de, argûmanên marksîst hene. Lê, ji bo ku rêxistina xwe xurtir bikin, motifên neteweyî û dînî bi kar tînin. Ev tiştêkî normal e.

Di van mehên dawîn de li ser kêşeya Kurdistanê mamosteyên zanîngehan hin xeber û lêkolînên dikin. Her çiqas deng venedabe jî pirtûkek nû bi navê "Anatomiya Terora Cudaxwaz: ÎRA, ETA, PKK (Bağlam Yayınları) hate weşandin. Nivîskarê pirtûkê mamosteyê Fakûltaya Peywendiyên Navneteweyî ya Zanîngeha Stenbolê Emin Gürses e.

**EMIN GÜRSES**, li Rizeyê ji dayik bûye. Bi binyata xwe laz e. Wî li zanîngehên Marmara, Boğaziçi û Zanîngeha Londonê ya Polî-Teknik û li Zanîngeha Londonê li ser Siyasetnasî, Aborînasî û Peywendiyên Navneteweyî perwerdehiya lîsans û doktora dîtiye. Li gorî agahiyên wî, wî ji bo amadekirina pirtûkên ji Mustafa Karasu û Serhat Bucak agahî wergirtine. Me di dema Fûara Pirtûkan pêre ya TUYAP'ê li ser piyan hevpeyvînek saz kir. Gürses di pirtûka xwe de wekî sedema bingehîn a pêşketina ÎRA, PKK û ETA'yê pîrbûna belengazî û belengazan destnîşan dike. Wî demêkê berê li ser heman mijarê jî bo rojnemaya Cumhuriyetê jî rêzênivîsek amade kiriye. Di nixandina û ramanên Gürses de tesîra îdeolojîya fermî serdest e, digel ku hin nixandînan wî yê cihê reng hene jî. Emin Gürses gava navê PKK'ê bi lêv dike jargona fermî bikar nayne, dibêje 'Kurdistan İşçi Partisi'. Lê agahiyên ku wî di pirtûka xwe dane bi piranî nêzikî nixandînan rayedarên dewletê ne.



**We di pirtûka xwe de gotiye PKK tilyakan (narkotik) difiroşe, lê te gotin ku Tirkiye vî karî dike.**

⇒ Ez nabêjim, dewlet vî karî nake. Bi hin kesên din dide kirin. Lê niha Partiya Karkerên Kurdistan jî aliyê aborî ve dikare xwe finansê bike. Pêwîstiya wê bi van tiştan tune ye.

**Lê gelek saziyên navneteweyî û Tirkiyeyê dibêjin dewlet şer bi firotina tilyakan finance dike?**

⇒ Ev tiştêkî normal e. Berê pawanên (tekel) mezin yê rojavayî karê firotina tilyakan dikirin. Lê niha jî ber ku ne di bin kontrola wan de ye, naxwazin ev kar bimeşe. Lê tilyakên bingehîn ev pawan difiroşin.

**Ev bi salan e, PKK ji aliyê ronakbîrên tirk ve tê rexnekirin. Li aliyê din jî bi tekoşina PKK kurdekî nû hate afirandin. Ev kurdekî nû ji bo dewlet û civaka tirk jî ne erênî û hilberîner e?**

⇒ Belê, ji bo dewlet û civak tirk jî baştir û erênîtir e. Sîstema feodal bi giştî têk çû. Ev qonaxêke pêşverûtir û baştir e. Bêguman Partiya Karkerên Kurdistan rêberiya vî karî kir. Lê divê rêxistinên bi vî rengî bizanibin "wê kengê dawî li çalakîyên xwe binin." Ku çalakî bi serê xwe bûn armanc, ev jî bo hemû rêxistinanan dafikeke. Lê rayedarên PKK'ê vê yekê dizanin.

**Wekî diyar e, tekoşina tirkan a neteweyî wekî tiştêkî pîroz tê binavkirin. Lê rewşa kurdan a îroyîn jî ya tirkan ne xerabtir e? Îro Qurana bi kurdî jî qedexe ye...?**

⇒ Êdî ne qedexe ye. Qedexeyî rabû. Wê demê welatek hatibû dagirtin. Îro kurdekî dikare li Fatîhê rûne. Kes jê re tiştêkî nabêje. Wê demê ne wisa bû. Tevgera wê demê ne tevgereke çîneyî bû, tevgereke rizgarîxwaz û neteweyî bû.

Di dema osmaniyan de jî, kurd bîndest bûn, lê niha ne wisa ne. Ev tiştên normal in. Kurdan berê nikaribûn bi kurdî biaxivin, lê niha diaxivin. Niha ne qedexe ye.

**Dîsa hûn di pirtûka xwe de KHRP (Projeya Mafên Mirovan a Kurdistanê) û serokê wê Kerim Yıldız tawanbar di-**

kin...

⇒ KHRP jî bo PKK dibêje "komekê çekdaran rêxistî", ev ne dîtineke rast e. Ez nikarim jî bo mamoste Kerim bibêjim piştgirê PKK'ê ye, lê gelek caran min ew digel Mustafa Karasu dîtiye.

**We gotiye Rêxistina Efüyê bi awayekî alîgir tevdiqere?**

⇒ Rêxistinek, welatê ku lê bi cih bûye, bi hêsanî nikare rexne bike. Lê ev rêxistin welatên din bi hêsanî rexne dikin. Wekî mînak, li Îngilistanê jî ber ku min kirinên pawanên îngilîz rexne kirin, ez jî Partiya Karkeran (Work Party) hatim derxistin.

**Hûn jî bo 'terora dewletê' çi difikirin?**

⇒ Di cihanê de, hemû dewlet metoden terorîst bi kar tînin. Wekî mînak El-manyayê endamên RAF'ê kuştin.

**Ma dewleta tirk jî bo kurdan heman tiştî nake?**

⇒ Na, ku wisa bûya li Stenbolê du milyon kurd hene. Rê nedida van kurdan.

**Lê kesên wekî Algan Hacaloğlu jî dibêjin "Terorîzma dewletê heye"...**

⇒ Nizamim!.. Herin jî wî bipirsin. Bînerê, em li vir çi xweş diaxivin. Gelek hevalên min yê kurd hene. Çepgir jî ketine girtigehê, ne bi tenê kurd. Feqîrî li her derê Tirkiyeyê heye.

**Lê rewşa İsmail Beşikçi heye? Eşber Yağmurdereli jî ji ber dîtinên xwe yê li ser kurdan ket hepsê...**

⇒ Ez dîtinên Beşikçi napejirînim. Beşikçi dibêje şer baş e. Ji bo ku dewlet tavîzan bide divê gerîla şer bike. Ku tu mirovekî re bêjî rahêjê çekê, here vî mirovî bikuje. Ev handana şer e.

**Ma ne sûcekî ramanî ye?**

⇒ Di hin nivîsên xwe di dibêje; divê şer bê meşandin. Ku yek bêje mirovan bikuje, ev ne sûce ramanî ye. Heke tu bibêjî dewleteke kurd ava bike, ev dîtin nakeve çarçowaya sûcên ramanî. Ev teşwîqariya şer e.



# Helbestvan û nivîskar Murathan Mungan: "Ez dixwazim destana Kawa binivîsim"

**D**i roja 14'ê berfanbara 1997'an de li Navenda Çanda Mezopotamyayê bi helbestvanê navdar Murathan Mungan re, li ser wêje, çand, ronakbîrî û şerê ku li Kurdistanê didome gotûbêjek pêk hat. Gelek kes bi çokeke mezin beşdarî vê gotûbêje bûn. Bi pirs û bersivan gotûbêj çû serî.

Di gotûbêjê de Mungan, giraniyê berbiçav da ser netewebûn û navneteweyîbûnê. Li gorî dîtin û ramanên Mungan, ne gengaz e ku mirov ji çand û hunera cihanê sût û fêde wernegire. Lê her çiqas ew di helbestên xwe de gelek caran remzên (sembol) mezopotamyayî bi kar bîne jî; ji hesên netewebûnê dûr dimîne. Mungan li ser vê mijarê wiha dibêje: "Heke bi tenê hûn neteweyetiyê binin zimên, wê gavê hûnê bi tenê li cografyayê bîne hezkirin. Her çiqas kesekî afrîkî nikaribe cerekî (testî) ji axa Qoserê (Kızıltepe) çêbike jî, dema kesekî japonî vî cerî bibîne pêwîst e dilgêş û perog bibe."

Murathan Mungan dixwaze ku her kes xwe bi nivîs û peyvên îfade bike, ji bo vê yekê jî rewşeke demokratîk pêwîst dibîne. Mungan analîzeke balkêş jî dike: "Divê mirov di doza xwe de pir ji dil be. Heger pêwîst be divê mirov di ber vê dozê de yekî bikuje û xwe bide kuştin. Lê pêwîst e ku di vê merhaleyê de şerê afirandina çand, dîrok, huner û wêjeyê jî bê kirin."

Li ser pîrsa "Hûn çima reaksiyon li dijî şerê qirêj nîşan nadin?" Murathan Mungan pêşî hêrs bû û nexwest bersivê bide, lê pişt re wisa got: "Hatina min a NÇM'ê bi xwe jî helwesteke dijî şerê qirêjî ye û bîst salên helbest-

vaniya min jî helwestek e."

Li ser ronakbîrî tirk, ku li dijî şer reaksiyona xwe nîşan nadin jî Mungan, "Ji bo jiholêrakirina şerê qirêjî ne pêwîst e ku mirov ronakbîr û hunermend be, kesekî jî rêzê jî divê ji vê rewşê xwedî agahî be û li hemberî vê neheqiyê serî hilde" got. Mungan li ser vê mijarê biranîneke xwe vedibêje: "Rojekê ji bo dozeke em li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) bûn. Wan rojan jî şerê dijwar pêk hatibû. Li ser vê yekê ronakbîrêkî (!) rabû û wiha got: 'Ji me çend kes ji wan çend kes hatine kuştin?' Li ser vê gotinê bi rastî jî ez şaş û metel mam. Ronakbîrêk çawa radibe û tiştêkî bi vî rengî dibêje?"

Helbestvanê navdar, der heqê Têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê jî dîtinên xwe wiha anî zimên: "Di şerê ku li Kurdistanê tê meşandin de dê gelê kurd bi ser bikeve. Lewre jî îro baş diyar dibe ku di nav şer de ruhê gelê kurd perwerde dibe. Lê bi wateyêke din jî di cengan de kes bi ser nakeve." Mungan, qala ronakbîrî

ku xwe înternasyonalîst dihesibînin, lê di bin vî navî de nijadperestiyê dikin jî kir: "Ronakbîrî ku dîh li hemberî îşkenceyên li "Qesra Ziverbey" derdiketin gelo îro çima guh û çavên xwe ji îşkenceyên li Şirnexê re digirin? Em wan kesan jî dibînin û baş nas dikin. Ji ber vê yekê divê parastina "yek-nasnameyê" çênebe. Mirov bi vê kirina xwe nabe hemwelatîyê cihanê. Lê di warê hemwelatîbûna cihanê de sûda gelê kurd heye."

Mungan di helbestê xwe de dixwaze xwe îfade bike. Tiştên ku dilê wî diêşînin, tiştên ku qirika wî ziwa di-




kin dixwaze binivîse. Ev yek di serê hel-

bestvanekî/ê de dinyayêke nû diafirîne. Ew dixwaze bi nivîs û fikr û ramanên xwe gelek kesan biqehirîne û zivêr bike, lê bi awayekî zanîstî û helbestî...Di wî warî de dixwaze gel biguherîne, lewre jî ew dixwaze bi nêrîneke çînî li gel binêre. Bo nimûne Mungan, Ahmet Arif nirxandîneke ku li xweşiya gelek temaşevanan neçû kir. Li gorî Mungan her çiqas Arif ji aliyê şêwe û zimên ve xurt be jî ji aliyê naverokê ve feodal û pederşahî dimîne.

Temaşevanekî bi bîr xist ku wî li ser Yılmaz Güney li "Fakûlteya Ziman, Dîrok û Erdnîgariyê ya Zanîngeha Enqereyê" (DTCF) "tez" amade kiriye û ev tez ji hêla zanîngehê ve hatiye pejrandin, pişt re jî xwest ku bizane ka ew îro jî dixwaze li ser Yılmaz Güney tiştan çêbike an na? Wî got: "Jixwe îro filmên Güney di TV'yên tirk de tene nîşandayîn. Heger tiştêk hatibe bidestxistin pêwîst nake ku di ber de têkoşîn bê dayîn."

Ji sala 1990'î heta niha 200.000 pirtûkên wî hatine firotin. Di nav pirtûkên wî de yekemîn car pirtûkeke bi navê "Li Rojhilata Dilê Min" bi kurdî hatiye weşandin. A balkêş ew e ku ev pirtûk bi piranî li Ewrûpayê hatiye firotin. Ji ber vê wergerê Mungan kêfxweşiya xwe tîne zimên. Ciwan Haco dixwaze di pêşerojê de helbestên di vê pirtûkê de bike stran. Li hêla din mizgîniya wergera kurdî ya pirtûka bi navê "Taziyê" di demeke kurt de ragihand beşdarî. Her wiha Mungan dixwaze "Destana Kawa" bi şeweyekî cihêreng binivîse. Bi gelemperî jî ew dixwaze li ser motifa "şeytan" raweste...

ŞEXMÛS ÖNAL



Murathan Mungan li ser gundên ku hatine şewitandin ev her du rêz nivîsîne: *Bêrtvan kîjan gund ê te bî İroj kîjan dîrxan...*

**H**elbestvanê navdar Murathan Mungan: "Di şerê ku li Kurdistanê tê meşandin de dê gelê kurd bi ser bikeve. Lewre jî îro baş diyar dibe ku di nav şer de ruhê gelê kurd perwerde dibe. Lê bi wateyêke din jî di cengan de kes bi ser nakeve."



Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 20.12.1997 Şemf: Pêşandana Semahê, saet:14.00

Konsera Salihê Qubînî, saet:17.30

● 21.12.1997 Yekşem:

Dilana Koma Serhildan, saet:14.00

Konsera Koma Vengê Sodirî, Saet:17.30

● 22.12.1997 Duşem: Şevên Toreyê (Jiyana Rewşen), saet:17.30

● 26.12.1997 În:

Film: 'Pînpînok', derhêner: Franklin Scaffer, saet:18.00

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya İzmir

● 20.12.1997 Şemf: Rojê Xwarinên Kurd ya Kevneşopî ya 17'an, saet:18.00

● 21.12.1997. Yekşem: Konsera Koma Tofan, saet:18.00

● 24.12.1997 Çarşem: Panela li ser "Tevkujîya Meraşê", beşdar: Ali Yavuz û Ibrahim Ülger ji rêveberiya HADEP'a izmirê, saet:18.00

● 26.12.1997 În: Konsera Koma Azad, saet: 18.00

Li BEKSAVê

● 21.12.1997 Yekşem: Panel: "Rojên em tê de û derbirina ramanan", saet: 17:00

# Rojekê "Sarya"

**Wê rojek bê hemû mirovên dilpak/  
Hew bitirsin êdî/ Ji bo gezek nanê  
tîsî/ wê xerc nekin hemû hêza xwe/  
Gava ku destê wan di nava hinguvde/  
di stûyê me de benik/ Lê em li  
benda rehma wan namînin/ Êmê  
bimrin belkî/ Lê bi serbilindî/ Dema  
ku meşîya natewe serî wî xortê ku  
bûye mîna kalekî/ Wê biterikîne  
gavên meşîna tirsonek/ Em serbilind  
û dilovan/ û tiştê herî xweşik jî/ Wê  
azadî bipêçe hemû bedena me.**

Dema ku Sarya ev helbest nivîsandibû hê kela dilê wê bû. Gelo wê rojê çî di dilê wê re derbas dibû ew nivîsandibû. Sarya ango Nursen, ew roj bi destê xwe yê pak û tenik rahiştibû pê-nûsa giran, ku ji murekeba wê azadî, bi xezên stûr derdiketin. Hêviya bi salan bû, perê xwe li dor laşê wê pêçabûn. Ew heps bûbû. Di helbesta xwe de serî li ber tirsakiyê rakiribû. Li dijî zordestî û zehmetiyan riya rast nişan dabû. Belkî mirin hebe, lê mirineke bi serbilindî xweştire goti bû. Sarya şanogereke zor şareza bû jî. Sarya lalbûna jineke kurd dîsa bi dansa wê, bi bedena xwe ya sivik nişan dabû. Baskên wê yê ku ew ber bi ezman ve bi pey azadiyê dixist hê hêvidar dikir. Dansa xwe li dijî korbûna xwe, li dijî lalbûna xwe, li dijî nebûna xwe, li ser sehne yê li gorî ritma muzîkê carina giran, carina bi lez dilîst. Ronahiyeke xwe ji çavê wê dida der, nikaribû bipeyve, lê



bi mîmikên xwe, bi tevgera hemû laşê xwe azadî dixwest, ne koledarî. Jiyan li ber hatibû astenkirin, li vî alî çiya û li wî alî çiya, hawîrdor awirên reş. Dixwest ku biqîre, dixwest ku awaza wê li çar aliyên Kurdistanê belav bibe. Dixwest ku Riya axaftinê nişanî jinên lal yên ku nikarin ne bi bedena xwe, ne bi zimanê xwe derdê xwe bînin zimên, bide.

Berî her tiştî Nursen İnce ango Sarya, rojnamegerek bû. Di rojnameyên Özgür Gündem, Özgür Ülke û Yeni Politikayê de kar kir. Di warê çand û hurerê de jî xebatên wê hebûn. Li KAYY-DER'ê di "Şanoya Evîna Welat" de, li NÇM'ê ji deme-

ke dirêj di nav koma folklorê de cih girt. Ji aliyên din ve hin çalakiyên wê din jî hebûn. Lê sarya kete nav refê gerilla, îcar bi dest hûnerêkîdin kiribû. Bûbû welat parêz, hunera welatparêziyê, li serî çiyayên Zagrosan, cûdiyan û hwd. hîn dibû û dida hîn kirin. Ji rojnameya Ülkede Gündem rêzenivîsek amade kir. Bi sernavê "Umuda Kurşun İşlemez (Berik li hêviyê bandorê nakin)".


Lê niha hew deng jê derdikeve. Em dizanin

ku çawa di wêneyan de rûyê wê di beşişî, vêga jî her wisa ye. Tiştêkî ku em zêdetir bibêjin nî e, riya azadiya di lihevdana baskên xwe de dîtîbû. Dizanibû ku wê ew baskên wê, wê bedena sivik rake û ber bi azadiyê ve bibe. Hevî dikir loma navê helbesta xwe "Wê rojek" danibû.

AZAD ALTUN

## TÎŞK

Nivîsa nivîskarê  
me nekete destê  
me




BEKIR BAHOZ

Lêborîn:

Hefteya borî di vî quncikî de sernavê nivîsa nivîskarê me Lerzan Jandîl xelet derketibû, rastiya wê, 'Raştiya dîroke' ye.

Her roj bi rûpelekê dîroka xwe bixwînin, zimanê xwe hîn bibin, çanda xwe binasin. Bi kurmancî û dimilkî; dîrok, çand, portre, agahî, bûyer, tiştonek, çîrok, qerf, gotinên pêşîyan û bi kurmancî dimilkî ferhengok Salnameya Navenda Çanda Mezopotamyayê derket.



SALNAMEYA ROJÊ  
YA BI DEMJIMÊR  
1998



mezopotamya' Has. Yay. A  
kîlal Cad. Tuzla' Har. No: 3 / I  
Bevşulu / İSTANBU  
30212 251 11 00 07 192 01 50  
0212 251 11 86 00  
Hilafes Stenbol  
0212 251 2928 Fax: 302 11 50

Navenda Çanda Mezopotamya



## Qaz

Smeilê biçûk çend roj e ji xwarin û vexwarinê ket. Bi hesre-teke ku her xedar dibe, ji sibe-hê heya êvarê, li asîman mêze dike.

Dê û bavê wî, di berbanga sibê de, ji bo ku nêrgisan berhev bikin ji malê derdikevin... û dibe tarî vedigerin... Cî-ran li Smeil xweditiyê dikan... lê ew bi evîna Smeil; ku pêk tê, mezin dibe û bi ser de diçe û xwe dide her alî, nizanin... Bes, dibêjin, "Lawo Smeil! Çi heye di asîman de, gû heye?"

Diya wî jî jê dipirse: "Li benda çi yî, bavê min?"

Smeil, mirazê xwe ji tu kesî re nabê-je...

Rojekî, Smeilî hîs dike ku, dilê wî kêfa ku dilê wî pêçandiye hilnagire... Kêfa wî diavêje rûyê wî... çav û rûyê wî dikenin... Ew, wê qazê ku her cure rengên dinyayê di per û baskê xwe de dihevine, dibîne...

Bi kêfa zarokan; wê kêfa germ, ku mezin nikarin têbigihêjin, Smeil diji... Ber bi aliyê ku qaz difire, Smeil baz di-de û avê dipejîkine...

Qaz tê xwarê, nav ava zivistanê ku hê xwe jê nekişandiye... Li nav kulîl-kên zer û sipî...

Smeil cihê ku qaz veniştîye dibîne. Beyî ku wê veciniqîne, heta ku dikare ew xwe nêzî wê dike... di destê wî de çoyek, ku bi qesta tivingê bi xwe re digêrîne, heye...

Qaz hîs dike... hildipere... bi baskên xwe, avê dipejîkine û wan li hev dixê... difire... û Smeil di nav xemên bêpayan ê dixeniqîne... Çavên wî li pey wê dinihêrin, tivinga xwe û bi temamî hêza xwe diqire...

"Teeq! Teeq!"

Û di asîmanê şîn de dibe niqteyek qaz... Ew dibe tehma lênêrina li dinyayê ji bo Smeil...

Çerçî... berber...devecî tên gund... û rojekê jî nêçîrvan tên. Smeil, tiştên ku wî diperoşînin û kêfa wî tînin dibîne... tivingan... û dûrbînek... bi dûrbîne nêzîkirina dûrahiyê cara yekemîn wê rojê hîn dibe...

Gava ku seyidvan çavdêriyê dikan, Smeil dûrbîne didize... Bêyî ku hisa kesî pêkeve, wê vedîşere li cihekî.

Seyidvan, li ser windabûna dûrbîne hêrs dibin... Gundî şerm dikan... Şaş dimînin... lê digerin... li ser difikirin:

"Gelo kî dikare bîdize?"

Herkes pîrsa qazê ji hev dike.

Dawî nayê...

Buxtankirin...parastin...genge-şi...şer...

Seyidvan, bêçar û dilşikestî, li cîpa xwe siwar dibin... Galegal dikan...

"Ez dûrbîna xwe dixwazim gelî gundiyan", dibêje xwediyê dûrbîne.

Gundî di nav şermê de dimînin...

"Gelo kî dikare bîdize?..."



Herkesî di ber çavan re yek bi yek derbaş dikan. Tên li ser çend kesan disekin... Gundî hemû, ji bo ku namûsa xwe xelas bikin, beşdarî karê lêgerîna dûrbîne dibin...

Dê û bavê Smeil, wî didin ber sewalan, li devê wî digerin... Lê didin... îsot di devê wî devê wî didin, wî di bin sêlikê de asê dikan... Dawî nayê...

Gundî bi ciddiyet û berpirsiyariyê mezin li vî karî hûr dibin... ew ên ku zarokên xwe didin ber sewalan, jinên ku bi mîrên xwe re şer dikan, bi tenê li ser tiştêkî disekin... Namûsa -gundê me divê xelas bibe...

Smeil, bi dilovaniyê mezin li bendê disekine, dîsa ew ê qazê ji nêzîktir ve bibîne... sebra wî nayê...

Quling, werdek, qefle bi qefle qaz derbas dibin... Ew bes li benda qaza xwe disekine... Û qaz tê... asîmana şîn ti-

ji kêf û şahî dike...

Baz dide Smeil...Bêyî ku bala kesî bikişîne, dûrbîne ji cihê ku veşartiye dertîne, bi dizîka ji gund derdikeve...

Qaz, li cihê ku lê hîn bûye tê xwarê dîsa... Smeil, her ku karibûye nêz bûye... Dûrbîne tîne ber çavên xwe... di nav xumamê de, li ber pozê xwe dibîne qazê... Dûrbîne dadixe û lê dinihêre, qaz dîr e... Dîsa bi dûrbîne dinihêre... Ax! Çi xweş e... lê, dîsa vediciniqe...Çima dike ku bifire?...

Dûrbîne ji çavên xwe datîne... Qaz firiya...Çawa dibe, camêre ku baz di-de, dibîne... Bavê wî... Her tiştî têdigihê... Dest bi bazdanê dike...

Bav, bi gavên xwe yên mezin avê di-qelişe û tê... Smeil dizane ku dê çi bîn serê wî, gava ew bê girtin...

Dawiyê dîl dikeve ji bavê xwe re...Dûrbîna wî ji destê wî tê stan-

## zarok

din...lêdanê dixwe... Bav, nizane ku ji şerman çi bike û çi neke... Heya ku ew-ladekî wiha yê mirov hebe, bila nîn be çêtir e...

Gundî nikarin wî ji nav destê bavê wî derxin. Bav, şênceyên cur bi cur li Smeil dike.

Ji piyan, wî bi darê ve dadiliqîne...

Şîşe sorkirî di destên wî ve dike

Tu kes nikare Smeil ji destê bavê wî bistîne...

Di dawiyê de Smeil nexweş dikeve...Dê û bav bi rojan li ber serê wî disekin... Di dilê bav de, roj bi roj pejnên poşmanbûnê mezin dibin, hilber didin... Dilê wî bi lawê xwe dişewite... Li ber serê wî digirî... Wî dibin dixtor...

Bav, lawê xwe ji piştê xwe nayîne xwarê...Gava di nav zeviyan re derbas dibin, ew çavdêriyê asîman dike... Diya wî, li pey wî dimeşe... Av her ku diçe xwe dikişîne... belkê jî qaz dê êdî neyê... , Dipeyive Smeil:

- Bavo.

- Bêje bavê bavê xwe.

- Bavo, wê qaz bê, bavo?

- Wê bê kurê min.

- Wê kîngê bê bavo?

- Wê bê kurê min... di nêzik de wê bê...

Smeil bi tu awayî baş nabe... bavê wî diçe nêrgisan berhev dike...hişên wî jî li ser qazê nê niha...li asîman li qazê digere...

Smeil jî, bi arîkariya diya xwe, li pacê, li hewşê, li benda qazê disekine.

- Dayê.

- Bêje bavê diya xwe.

- Wê qaz qey neyê dayê?

- Wê bê bavê diya xwe...

- Lê nayê... mêze bike, ez nexweş jî ketim lê dîsa jî nehat...

- Wê bê kurê min.

- Ez jê zahf hez dikim... pir xweşik e, xwezî te bidîta...

Û roj derbas dibin dîsa...

Bav, gava ku nêrgisan berhev dike, dibîne yek baz dide, diqire...Telaşa wî, bavê ditirsîne...her tiştî ji bîr dike û baz dide...

Gava digihêje gund, kesên li bermalê civiyayê dibîne... Jinên ku digirî hene... Tiştêk dikeve ber qirika wî... Jina wî gava wî dibîne dibe îskefska wê û digirî...Çarşefek bi xêzên spî avêtine ser Smeil... Gundî, bi fêhm û piyarek mezin li bavê dinihêrin...


Gundi gorê dikolin...

Smeil di hambêza xwe de dibin gorê...Wê çaxê, tiştêkî ku dilê gundiyan zîz dike, pêk tê; qaz... qaza wî derbas dibe... Bav, bi derdê lawê xwe hîn diwartir dijî...

Û qaz, wekî her car li cihê xwe yê berê tê xwarê...



# Jiyana Rewşen



van radixe. Piştî vê sergotarê, nivîsa Sero-ka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen heye. Ew jî bi zimanekî wêjeyî qala vebûna NÇM'ya Rihayê dike.

F. Huseyn Sağmîç di vê hejmarê de li ser Elî Herîrî radiweste. Feqî der barê jî-nenîgariya Herîrî de agahiyên hêja dide û di dawiyê de jî helbesteke wî pêşkêşî xwendevanên Jiyana Rewşen dike. Di vê hejmarê kovarê de kurteçîroka Çiya Mazî ya bi navê "Agir jî dîl bû" jî hatiye weşandin. Mazî bi vê berhema xwe beşdarî "Pêşbaziya Kurteçîrokan a Beşa Hunerên Dîtbarî ya NÇM'ê" bûbû û xelata handanê standibû. Di çîrokê de şewitandina gundan bi şeweyekî hunerî hatiye zimên.


Di vê hejmarê kovarê de giranî li ser helbestan e. Kesên ku helbestên wan di hejmarê 14'an a Jiyana Rewşen de cih girtine ev in: A. Rahman Çelik, Kawa Nemir, Rênas Jiyân, İbrahim Seydo Aydoğan, Kemal Orğun, Cegerxwîn, Miraz Ronî, M. Hemo, Bavê Kardox.

Di Jiyana Rewşen de tekane nivîsa ne bi kurmançî helbesta Erdal Ceviz "Hefîna porvêsayî" ye. Ev helbesta bi kirmançî (dimilî) jî bo bîranîna Lîstîkvana Teatra Jiyana Nû Başak Kanat hatiye nivîsîn.

Çend nivîsên li ser zargotinê yê vê hejmarê jî ev in: Mehmudê Tolaz (İkram İşler), Hoy Necmano (Yusuf Cigerpel) û fabla Abbas Alkan "Mirîşk bûn azadixwaz."

SERWÎSA ÇANDÊ

## Heftenameyeke nû ya bi kurdî:



# Awîyar

Li bajarî Sine (Senendec) li navenda Rojhilatê Kurdistanê heftenameyeke nû bi kurdî-farsî dest bi weşanê kir. Navê vê heftenameyê jî "Awîyar" an ku bi farsî dibêjin "Abîder" e. Xwediyê wê Mehmed Reza Rehîmî ye, ku yek ji mirovên payeberzê kurdê Rojhilat e û çendî berê jî Wîstandarê Kurdistanê bû. Her wiha sernivîsarê Abîderê jî kak Baramî Weled Begî ye ku yek ji xort û gencên jê-hatî yê kurd e.


Heftenameya ferhengî, hunerî, çandîya Awîyar hemî rojên şemiyê li hemû bajarên rojhilatê Kurdistanê, Azerbaycana Rojava tê belavkirin.

Pir law û xortên kurdên rojhilatê Kurdistanê di vê belavokê de dixebitin û nivîsaren xwe di wê de didine weşandin. Nivîskarê me Ehmed Şerîfî jî di Abîderê de nivîse û gotarên xwe yên lêkolînî dide Awîyarê. Em ji bo Awîyarê temenekî dirêj dixwazin.

Hejmarê 14'an a Jiyana-Rewşen derket. Di vê hejmarê kovarê de li ser mijarên cur bi cur ên wêjeya kurdî nivîs hatine weşandin. Kovar bi sergotarê dest pê dika, di vê sergotara bi navê "Stranek, helbestek û govendek" de li ser pest û pêkutiyên dewletê yên li ser NÇM'ê tê sekinîn. Dîgel vê yekê sernivîskarê kovarê balê dikişîne ser wate û girîngiya çanda kurdî, wekî saziyeke çand û hunerî rola NÇM'ê li ber çavê

## Rewşa wêjeya kurdan a klasîk

CELALETTİN YÖYLER



Edebiyata kurdî di medreseyan Kurdistanê de, bi sedan salan e ku bê xwedî û bêxwedan, hem jî veşartî di nava pirtûkxaneyên melayên medreseyan û ronakbîrên kurd de devgirtî û nexwendî mane. Lê gava ku em li van berhemen kevnare yên medreseyê dinîhêrin, em dibînin, ku her yek ji wan berheman xudanê gelek nîrxên mezin û hêja ne. Lê pir mixabin ew berhemen çandî, edebî û gelêrî jî ber bîndestî, perîşanî û bêdewletîya gelê kurd mane bêlêkolîn û nîrxandinên zanistî û wêjeyî.

Çawa bi vê axîne nêzî çar sed şal berî niha, seydayê mezin û hêja Mele Ehmedê Xanî di dîwana xwe ya bi navê "Mem û Zîn"ê de qala bêxwedî û bêdewletîya gelê kurd dika û dibêje: "Gerdê hebûya me îtîfaqek/ Vêkra bikira me inqîyadek/ Tekmîl dikir me dîn û dewlet/ Tehsîl dikir me ilm û

hukmet." Bi rastî jî, perîşanî û bêxwedîtiya edebiyata gelê kurd her ji ber bêxwedîtiya gelê-kurd e. Hêvî û armanca me, gelê me, ev e ku wê ji vir şûn ve çand û wêje, hemû nîrxên me yên gelêrî, çandî bi xwedî bibin û geş bin, bibin wekî nîrxên gelêrî yên her kesê li ser qada cihanê. Lewre em jî wekî hinek kesên di cihanê de, êdî ji bo serbest-jîyanê û serbilindîya mirovahiyê, tê dikoşin. Lê hema bi têkoşîneke mezin û bi rûmet! A ji bo pêşerojêke bi rêz û rûmet divê kesên xwendî û ronakbîr, xwedî li berhemen kevnare yên kalikên xwe yên, wekî Ehmedê Xanî û Ehmedê Cizîrî û Feqeyê Teyran û mamosteyê mezin û hêja Seydayê Cegerxwîn, xwedî derkevin û wan biparêzin. Ji ber vê girîngiyê û pêdiviyê bi lîxwedî-derketina van berhemen kevnare yên pir-hêja, ez di xwazim di nivîsên xwe de bi giranî wan berheman derxim pêşberî xwendevanên Azadiya Welat û wan agahdar bikim, li ser girîngî û hêjahîya wan berheman. A ji bo vê yekê ezê di vê nivîsa xwe de dîsa çend misrayên ji dîwana "Melayê Cizîrî" jî bo xwendevanên hêja rêz bikim û bikime diyarî:

Şah bi qesta kuştina min rim hejandin

bêsebeb

Dema çermê qehr û xêşem rim li dil da


go edeb

Kuştîyên dîdar û dîne bêxeta her deh sed in  
Her seher dîsa ji nû ve tene kêrê sed celeb

Di beytê yekê de Melayê Cizîrî dibêje: Şah bi mebesta kuştina min rima di dest xwe de hejand, yanî ji bo êrişê li ser min. Hem jî bi çavê xişmê zorbetiyê, li me nêrî û rima di dest xwedî li dilê me da û ji me re got, 'xwedî edeb be'. Di vê beytê de Mela hezkirî û dilketiya xwe di radeyeke mezin de dibîne û jê re dibêje: "Şah" yanî ew hezkirîya xwe di mezinahiyê de dişibîne şahan. Teşbîhê di beyta xwe de bi kar tîne. Dîsa awîrên çavên dilberê her wekî çawa rimbazek rima xwe di bedena kesê li hemberî xwe de diçikîne, dilber jî wisa bi awîrên xwe yên wekî rimê bi ser wî de ber dide û dihejîne.

Eva hem teşbîh e hem jî mecaz e, lewre rim û awîr du tiştên cuda ne, lê şah û dilber di rengên xwe cuda ne, di bîngehê heyînên xwe de yek in, ji ber ku her du jî mirov in. Jixwe wêjenas û zanista wêjekar bi teşbîh û mecaz û kinayetan beytên xwe dixemilînin û bi vê yekê mezinahîya xwe nîşan didin. Ramana wêjenasan di watekirinên beytên wan de, di pirên beytên wan de, ji hêla şîroveker ve nayê zanîn, lê şîroveker jî mafê wî yê şîrovekirin heye ku şîroveya xwe bi wateyên cur bi cur diyar bike û nîşan bide.





# Xwarziyê Xwedê

**Y**ekî gerok diçe gundekî, ji xwe re li parsê digere. Dema dibe êvar, ji bo ku li malekê bibe mêvan derî bi derî digere, lê kes wî nahewîne. Ji xwe re difikire, dibêje: "Divê ez konetiyekê bikim, nexwe kes min nahewîne." Diçe ber deriyekî, li derî dixwe, xwediyê malê derdi-

keve, gerok jê re dibêjê: "Evara we baş, ez xwarziyê Xwedê me û ezê îşev bibime mêvanê we." Yê gundî bi destê wî digire û dibe ber mizgeftê û jê re wisa dibêjê: "Heger tu xwarziyê xwedê bî, a ha va ye ev der mala xalê te ye."

## Dizo Dizo

**D**iz ketibûn mala Heko. Gelek alavên wan dizibûn. Malbata Heko bi pey diz ketibûn. Bi hawar û gazî nivê gund jî bi wan re bi pey diz ketibûn. Heko jî rabû ku kes di mal de nemaye. Wî jî ji neçarî beradû gaziyê da. Dema gihîste dawiya gaziyê bangî gundiyan kir, got: "Bisekinin.. bisekinin! Kesê ku ji heqê diz derkeve ez im. Hûn giş bisekinin."

Gundî giş sekinîn. Heko bi tenê da pey diz û xwe gihandê. Tevahiya gundiyan digotin "Ka bê wê ew û diz çi bînin serê hev?" Lê Heko pêşiya diz girt û tiştek jê re got û ji lingê ling de vegehiya hate cem gundiyan. Gundî giş bi peroşî (heyecanî) jê re got.

"Te çi kir Heko. Ma te çima diz berda?"

Heko: "Ma min çi kir, çi nekîr!... weleh min ew hetikandin ku heta bijî vê yekê ji bîr nake, lê ku namûs di pozê de hebe."

Gundiyan got: "Êêê te çi pê kir!" Heko: "Weleh ez li pêşiyê zivirîm û min jê re got; dizo... dizo... dizo....!"

## Deveya li ser minarê

**D**êrik sibê zû bangî jina xwe kir: "Keçê hela zû were vê derê." Tiştek bi serî wî de hatibû, lê fedî dikir ku ji jina xwe re bibêjê. Jina wî hat ba wî got: "Çi ye kuro! Sibê zû ya Elah ya Xwedê, te hîn nû çavên xwe vekirine?" Mêrik got: "Zû ji min re gazî mele bike bila were vê derê." Jina wî bi lezgi-nî çû bangî melê kir û bêhnek derbas bû nebû mela kete hundir. Mela li ser wî sekinî got: "Çi ye bibêje!?"

Mêrik bi melûlî dest bi peyvê kir: "Îşev min xewnek dît... Mele got: "Êêê Xwedê xêr bike, bibêje..."

"Di xewna min de, min dît zebeşek li ser pozê minareyê bû, li ser zebeş jî textek hebû, li ser wî textî jî deveyek û ez jî li ser devê siwarî bûm." Mele got: "Êêê bibêje xwedê mirov bisitirîne..." Mêrik dom kir: "Bêhnekê em wiha li ser minarê sekinîn. Lê min hew lê nihêrî ku minare kil bû. Her diçû pir kildibû û carekê ez, deve, text, zebeş û minare bi hev re hatin xwarê..." Mele got:

"Star...star...! E çawa te bi bin xwe de bemedat?" Mêrik got: "Ê jixwe min jî va ye bi bin xwe de berdaye."

ÇETÎN MÎZAN

### BI XELAT...

### XAÇEPIRSA BI XELAT (99)

### XAÇEPIRSA

Şevçeyê	G	G	↑	A	E
LEŞLAZANÂN					
VIR	O	L	A	N	D
ŞEL	Î	L	O	T	E
R	M	T	↑	K	E
Ê	A	Z	R	N	R
R	Z	E	R	E	B
R	O	A	M	A	D
M	Î	↑	M	A	L
B	A	N	K	T	N

### Bersiva Xaçepirsa 96'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 99'an Salnameya NCM'ê ya 1998'an e.

**SALNAMEYA ROJÊ YA BI DEMJIMÊR 1998**


avenda Canda Mezopotan

**Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 97'an pirtûka bi navê "Mezopotamya da dinlerin doğuşu ve gelişimi" qezenc kirine: Haydar Gündüz/Erzîrom, Mehmet Savur/Semsûr, M.Emin Gök/Stenbol, Sérhat Zêmin/Riha, M. Şah Çelik/Êlih

Şehidek	Berepaşki sulh	Bi latîni xwe, ez Gihaneke k	Dawera itiryumê Eleke kurd	Din	Paytaxtek
Gotubêj	Resmî			Nexewesly ek	
				Senceq	
				Nijadek	
Rû...		Welatek			Dawera Tritumê
Afyonek		Rêveberê Zanîngehê			Aşina
			Musbet		
			Dawera Hidrojenê		
Cinavkek		Yezdanê nepakyê			
Beşek ji mil		Mêr			
			Dengdêra 'Nir'	Pixembere k	
			Bangawazî	Hanin	
Tipeke kurdi Paşgireke k	Oti Tipekî			Dawera Argonê Endam	
		Eko			
		Veqetande kek			
Dawera Karbonê Rêxistineke kedkaran	Erd Dawera Kikürtê				
			Xwarina sereke		

PEYVA VEŞARÎ





Owaz



## Ceniyan şero lîmin protesto kerd

14'ê meng de Komîsyonê Ceniyanê HADEP çosmeyê kerdenanê "Hefteyê Haqanê Mardiman" Stenbol de rêzila aşti viraşt û wastenê xo yê aşti ardî zîwan.

Rojê hefteyê haqanê mardimanê 4'in de jew kerden jî hetê ceniyanê HADEP a Stenboliya, tewrbiyinê hîrê hezarî ceniyanê Lîseyê Galatasaray ver de virazyay.

Komîsyonê Ceniyanê HADEP beyannameyê heqanê mardiman ser, eşkerakerdin viraşt û îhlalê haqê mardimanê ke hetê dewleta tirk virazyenê, reaksiyona tûj mûsna, dewleta tirk û qandê nê îhlalan protestokerdin destê xo rêzila, çimê xo jî çapûto siyawa girêday û dewlet protesto kerd.

Komîsyonê Ceniyanê HADEP, aşti, azadiyê û zanayin sero vindardî û nînan ser jî vînaninê xo wina ardî zîwan: "Dewletanê faşîstan de, azadiyên ser, aşti ser û zanayin ser kam fekê xo akro hetê nê dewletana vardayin virazyeno. Çimki hemû dewletanê faşîstan de aşti û

azadiyê ser qiseykerdin qedexeyê wo."

Ceniyanê HADEP vat: "Goreyê beyannameyê heqanê mardiman, her kes şeno zîwandê xo de qisey bikro, dîndê xo de îbadet bikro, zîwanê xo de deyrî vajo û çandê xo ya weşîna xo biramo. Ancî goreyê beyannameyê haqanê mardiman her kes wayirê nê heqan o. Ek no wina wo çira ewro şarê kurd rê politikayê wahşetê benê, çira êkê beyanayê haqê mardiman imza kerdo iyê vengê xo nêvejenê û destek danê dewleta tirk û çira welatê ma de 13'ê seriyo şero lîmin û qilerino rameno?"

Komîsyonê Ceniyanê HADEP eşkerakerdin peyra hetanî Konsolxaneyê Fransa ver şiyayiş viraşt û konsoloxaneyê ver de bî vilay. Ceniyanê HADEP siyayiş û eşkerakerdin de nê sloxanî eyştî: "Bijî bijî serhildan, serhildana jinên kurd", "Artêşa kiştîx welatê ma ra vejîy", "Bijî biratiya şaran", "Ceniye şer nêwazenê"...

MABENDÊ VENGÛVAZAN

## Gündem vengê şarî yo

Nezdiyê di mengî yê rojnameyê Ûlkede Gündemo nêviradiyeno şarîstananê bakurê Kurdistanî. Perskerdinê wayir û gerîndeyê rojnameyê Ûlkede Gündemî ser, waliyê OHAL Aydın Arslanî, wayirê rojnamî rê mektûb rişt û mektûb de vat: "Nêviradiyayinê Ûlkede Gündemî persbenoyê ma de niyo û xebera ma jî çinya." La belê eynî walî l'ê meng de jî, goreyê qanûnê OHAL'î roten û vilakerdinê rojnameyê Ûlkede Gündemî şarîstananê OHAL de (yanê bakurê Kurdistanî de) kerd qedexeyê. Qedexekerdin ser rojnameyê Ûlkede Gündemî reaksiyona tûj mûsna biryarê walî û vînaninê xo rojname de wina ardî zîwan: "No biryar, biryarê waliyê OHAL'î niyo, biryarê MGK wo û qe jew teqet nêşeno verê rast nûstananê ma bigro, ma yê rastan-nûsten û xeftiyayanê xo zey verî biramimi. Qedexekerdin ser, reaksiyona zaf tûj jî, şarê kurd ra, ebi taybetî jî, şarê Amedî ra ame. Şarê Amedî qedexekerdin peyra jew eşkerakerdin viraşt û qedexekerdinê Ûlkede Gündemî protesto kerd û vat: "Madê rojnameyê xo rê wayir vejîyim. Çimki Ûlkede Gündem vengê ma yo azad o." Ancî qedexekerdin ser, 10'ê meng de bûroyê Ûlkede Gündemî Enqerî de tewrbiyinê, serdan û sermayanê İHD, Medya-Sen, HADEP, EMEP, SIP, KESK, DİSK, Genel-İş û SES a piya pêseramayin viraşt û qandê paştigirota Ûlkede Gündem û Êmekî platformê paştigirota na ro. Pêseramayin peyra platformê paştigirota qedexekerdin protesto kerd û vat: "Madê qandê hewadayina qedexeyê, wezîranê dewleta tirk ra, Murat Başeskioglu, Hikmet Sami Türk û İstemihan Talaya vînanin virazim, peyra jî şime Amed waliyê Amediya, waliyê OHAL ya, serokê belediyeyê Amedî ya, Şaxanê partiyayin û platformê Demokrasiyê Amedî ya vînanin virazim û biwazim qedexekerdin hewadiyo û Ûlkede Gündem şarîstananê kurdan de biroşîyo û vila bo.

Ancî xeylê cayan de wendoxê Ûlkede Gündemî amey pêser, xeylê cayan de qandê paştigirota rojnameyê Ûlkede Gündem rot û xeylê cayan de jî qandê hewadiyayina qedexeyê kampanyaya imza de destpêkerdin.

MABENDÊ VENGÛVAZAN

WELAT

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX:  
(0 212) 251 90 13

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re  
(Halkla ilişkiler müdürü)  
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:  
(Nünerê Giştî yê  
Ewrûpayê)  
Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 15

Brüksel:  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03

Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yûsiv  
Berlin:  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49 572 18 13 60  
Stockholm:  
Robin Rewşen  
46 87 51 05 64

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43



# Çand, civaka sivil, dewlet

Haluk Gerger diyar kir ku şerê qirêjî civaka tirk jî her alî ve dixurifine, jî mirovahiyê dîr dixê. Gerger, bal kişand ser ronahîbûna civaka kurd û got: "Kalikê tirkên heye (Atatürk), bavê wan heye (Demirel), xwişka wan heye (Çiller) lê dayika wan tune ye. Divê kurd bibin dayik..."

Roja 13'ê berfanbara 1997'an, ji hêla Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve li Navenda Çanda Mecidiyeköyê (Mecidiyeköy Kültür Merkezi) sempozyûmek bi navê "Kültür - Sivil Toplum - Devlet (Çand - Civaka Sivil - Dewlet) hate lidarxistin.

Sempozyûm ji 2 danîşinan pêk dihat û bêhtirî 500 kes beşdar bûn. Danîşîna yekemîn ji hêla Nivîskar û Mamoste Dr. Sungur Savran ve, ya duyemîn jî ji hêla Lêkolîner û Nivîskar İsmail Göldaş ve hate birêvebirin. Di rûniştina yekem de de wekî axivger; Endamê Hindekariyê yê Zanîngeha Bilgiyê Prof. Dr. Mete Tunçay, Nivîskar Doç. Dr. Haluk Gerger û Nivîskar Mehmet Metiner; di rûniştina duyemîn de jî, Parlamenterê Erzeromê yê berê Melik Fırat, Prof. Dr. Mahir Kaynak û Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Şefik Beyaz dîtin û ramanên xwe pêşkêş kirin. Di dawiya her du danîşinan de jî, axivgeran pirsên beşdaran bersivandin.

## Dewlet divê xulamê mirovan be

"Armanca sempozyûmêke bi vî rengî, nasandina rastiya gelên mezopotamîyê û xwesteka bihevrebûneke rûmetdar a van gelan e", bi van gotinan Şefik Beyaz danîşîna yekemîn vekir, spasiyên xwê pêşkêşî axivger û beşdaran kir, pişt re jî mafê rêvebirinê da Dr. Sungur Savran.

Dr. Sungur Savran beriya ku mafê axaftinê bide axivgeran çend analîzên balkêş kirin û got ku civaka sivil li rojava pêşketiye, lê her dem li rojhilat lipaşmayinek di vî warî de hatiye dîtin. Savran da zanîn ku, li gorî ramana Hegel; dewlet di ser her tiştî re ye û pîroz e lê di ramana Marks de dewlet, ne li derveyî



çinayetiye ye û çeka destê çîna serdestan e. Piştî van gotinan Savran, rexneyên xwe li ser tîgîha "rêxistinên sivil" anî zimên. Wî da xuyakirin ku ravekar îro vê tîgîhê ji bo hemû rêxistinên bi kar fînin û rêxistinên karker û karsazan dikin yek.

Piştî vê kurteşîroveyê Savran mafê axaftinê da Prof. Dr. Mete Tunçay. Mete Tunçay di axaftina xwe de li ser mijara; "Dirûvekî civakî, civaka sivil û bi dewletê re peywendiyên wê" rawestiya û got: "Li rojhilata Tirkîyeyê hakimiyyeta osmaniyan subjektîf û xudmuxtari bû. Ev serdestî ne mîna serdestiya ku li Balkanan û Stenbolê bû. Îro li Ewrûpayê li derveyî dewletê tê dîtin ku rêxistinbûnek heye. Pirsgirêka kurdî ya îro hê jî wan deman dest pê dike. Prof. Dr. Tunçay, diyar kir ku li gorî rayedarên dewleta osmanî, mîlet ne komên etnikî, lê

komên olî bûn; yanê kurd, tirk, laz, çerkez giş di nava mîletê misilman de bûne. Her wiha li gorî mezhebên xwe sê mîletên ermen hebûne; gregoryan, katolik û protestan. Li ser vê esasê kesên ku komara tirk ava kirine jî, mîletên misilman wekî yek mîlet pejirandine, lê navê tirkîtiyê li wan gişan kiriye, ev yek bi serê xwe nakokiyek bûye.

Li gorî ramana Tunçay bingeha kêşeya kurdî ev nakokî ye. Tunçay got ku ev kêşe, pirsgirêka bingeşîn a Tirkîyeyê ye, lê çareserîya kêşeya kurd bi tenê ne pêkan e, pêdivî bi çareserîyêke giştî heye. Ew jî rêveberîya xwecihî ye.

## Civaka sivil li dijî pişaftinê serhildan e

Piştî axaftina Prof. Dr. Tunçay, Mehmet Metiner û Doç. Dr. Haluk Gerger axivîn. Mehmet Metiner di axaftina xwe de bi giştî li ser mijara "Têkiliya çand, ol û dewletê" rawestiya û wiha got: "Bi derketina dewletên modern, civak û çanda neteweyan ji hêla dewletan ve hatiye tunekirin, asîmîlekirin û nasnameyên cihêreng hatine tepeserkirin. Ji ber vê yekê jî, derketina civaka sivil li dijî "sîstema yek-dewlet, yek-zîman û yek-netewê" serhildan e. Li vî welaî kesên îslamî, radikal, liberal, tirk û kurd diyê vê pîrsê bi hev re çareser bikin. Her wiha Metiner xwest ku, her kes jî xwe bipirse, ka ji bo çî dixwazin bînin ser kar. Heke wê bi qasî xwe li mafê her kesî derkevin, bila rewşa îro bidome çêtir e.

Di sempozyûmê de Haluk Gerger li ser sendîka, partiyên siyasî û medyayê rawestiya û wiha got: "Îro li vê derê jî min dixwazin ku ez behsa demokrasî û civaka sivil bikim, lê tiştên ku tunene ez de çawa behsa wan bikim. Rejîmêke an-

tî-demokratîk û mîlîtarîst li holê ye. Rejîma ku li ser kar e, dîrî rastiya çînî û pir-rengiya Anatoliyê ye." Gerger diyar ku şerê qirêjî civaka tirk jî her alî ve dixurifine, jî mirovahiyê dîr dixê. Dîr re jî Haluk Gerger bal kişand ronahîbûna civaka kurd û got: "Kalikê tirkên heye (Atatürk), bavê wan heye (Demirel), xwişka wan heye (Çiller) lê dayika wan tune ye. Dayikê jêderka dilovanî, hevgerî û dostaniyê ye. Kurd bi vê tîkoşîna xwe dibin dayika tirkên." Di dawiya axaftina xwe de Gerger da xuyakirin, wê azadî bi destê bereya gel û çînen çewisandî were.

Danîşîna duyemîn ji hêla Lêkolîner û Nivîskar İsmail Göldaş ve hate vekirin û birêvebirin. Di vê beşê de axaftina yekemîn, ji hêla Serokê Înstîtuya Kurdî Şefik Beyaz ve hate kirin. Beyaz bi giştî rewşa înstîtuyê şîrove kir û wiha got: "Xebatên me zagonî ne, bi awayekî fiilî em dixebitin, lê di resmîyetê de em jî hêla dewletê ve nayên nasîn."

Her wiha Beyaz, li ser pir-rengiya çand û hunera Mezopotamîyê sekinî, xwest sistemeke li gorî vî rastîyê bê damezirandin.

## Çareserî parastina pir-rengiyê ye

Pişt re Şewirmendê MÎT'ê yê berê Prof. Dr. Mahir Kaynak axivî. Kaynak pêşî bal kişand ser tîrsa rayedarên tirk a ji bo parçebûnê. Li gorî Kaynak ev tîrs jî bo dewleteke ku împaratoriyeke mezin ji dest çûye, normal e, lewre jî divê ku bi tenê doza mafên xwe yê rewa nekin, tevî wê divê der barê encama siyasî ya bi dayîna van mafan derkeve holê jî de, dilê rayedarên tirk rihet bike. Wê çaxê dê kêşeya kurd bi hêsanî çareser bibe. Kaynak got kurd û tirk bi salan tev jiyane, ji hev nabin, tevî şerê ku heye jî tirk kurdan ji xwe cuda nabînin û kurd jî tevî ev qas êş û jana ku kişandine, dijminatîya tirkên nakin. Pişt re jî got: "Li hemberî vî helwesta gelê kurd serê xwe ditewînim."

Di sempozyûmê de axaftina dawî jî hêla Parlamenterê Erzeromê yê berê Melik Fırat ve hate kirin. Fırat di destpêka axaftina xwe de bersiv da Kaynak û got: "Rewşa me dişibe kalekî ku mala wî hatiye şewitandin, zar û zêçê wî hatine kuştin, kesê ku ev yek bi me kiriye ji me re dibêje, 'we dît ez çiqas xurt im.' kes guh nade me, emê çawa dilê wan rihet bikin." Fırat di dîmahîka axaftina xwe de bîr û ramanên xwe digel serpêhatiyên xwe yê li ser rejîmê pawan (îfade) kir.

